


## Têkoşîn ji bo nirxên civakê ye

Di dîroka mêtîngeriyê de yekem car bi ser pîvanên ku civakê tîne gel hev û li hev radigire, êrîş pêk tê. Yek ji rêgeza şerê taybet ji holê rakirina nirxên civakî yên exlaqî û hêza fikrandina polîtîk a kolektîf e... ***Adar Şaman / R.2***



## Wateya têgehan û girîngiya vegotinê

Sedema gelek gengeşî, arîşe û lêkdanên civakî yek jê wateya şaş û ya din jî vegotina şaş a der barê têgehan de ye. Heta ku vegotineke rast pêk neyê, têgihiştineke rast pêk nayê. Heke vegotin tune be, têghihiştin jî tune ye... ***Adar Jiyan / R.5***



## AKP û MHP pêşiya xwe nabînê

Ev demeke Erdogan û wezîrên wî di her firstê de derdikevin pêşberî kamerayan û gefa li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dixwin. Bêgûman sedemên van gefan û zimanê êrîşkariyê ji ber lewazbûna rejîma AKP û MHP'ê ye... ***Felemez Ulug / R.6***


# xwebûn

8-14 MIJDAR 2021 HEJMAR: 99 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org


# 'Keştiya Azadiyê' ji bo Ocalan bi rê ket




Înîsiyatîfa ji Abdullah Ocalan re Azadî bi dirûşma "Dem hatiye, Ji Abdullah Ocalan re azadî, ji Kurdistanê re aştî" kampanyayeke navneteweyî da destpêkirin. "Keştiya ji Ocalan re azadî" di 8'ê mijdarê de ji Yewmenistanê derket rê û di 12'ê mijdarê de dê bigihîje Îtalyayê. Ji Almanya, Fransa, Swîsre, Brezilya, Spanya, Swêd, Îtalya, Yewnanistan û Îngîlistanê akademîsyen, siyasetmedar, nivîskar, nûnerên tevgerên jinan beşdar dibin... ***R.3***

## Gefên li dijî Rojava

Li gorî şîrove û analîzên ku tên kirin armanca sereke ya dewleta tirk ji van gefan ew e ku tevliheviyê di vê herêma bi ewle de derxe. Dixwaze xelkê herêmê bitirsîne û wan ji cih û warên wan bike. Ji aliyê leşkerî ve êrîşeke wiha ya vegirtina Rojava bêyî destûra hêzên navneteweyî ne pêkan e û li gorî agahiyên li ber destan... ***Dildarê Amedê / R.7***

## Şengal 6 sal in xweser e

6 sal berê di 14'ê mijdara 2015'an de Şengal ji destê DAIŞ'ê rizgar bû. Piştî YBŞ û YJŞ hat avakirin li Şengalê ewlehî û aramî pêş ket û Şengal jî ji destê DAIŞ'ê rizgar kirin. Hêzên parastinê di bin banê Meclisa Xweseriya Demokratîk a Şengalê (MXDŞ) de hatin komkirin. MXDŞ di çarçoveya xebatên civakî de navenda bajarê Şengalê jî tê de li her komalgeh û gundên wê meclis û komunên gel ava kir. Di van meclisan de civak bi rêkûpêkî li hev dicive û pirsgirêkên xwe guftugo dike û jê re li gorî derfetan li çareseriyê digere. Tevahiya saziyên Şengalê bi şêwaza hevserokatiyê xwe rêxistin kiriye... ***R.6***

# Şar vano: Tîya Kurdistan o

Cemîl Taşkeseno ke Sêrt de esnafî keno, seba ke Akşenere rê vatbî 'Tîya Kurdîstan o'ameybî destbendkerdiş û rayaumûmîye de vengê girdî vejîya. Dima ra akademîsyenê Unîversîteya Firatî ya Xarpêtî Hîfzullah Kutumî serê hesabê xo de parekerdişê 'Bicuyo Kurdîstan' pare kerd û gure yê xo ra ame girewtiş û ame desbendkerdiş... ***R.9***




## Beriya hilbijartinê kursî parvekiribûn

Hilbijartina pêşwext a parlamentoya Iraqê di 10'ê cotmehê de hat lidarxistin. Li seranserî Iraq û başûrê Kurdistanê 23 milyon û 986 hezar û 741 kesan mafê wan ê dengdanê hebû. Lê li gorî komîsyona hilbijartinê aşkera kir ji vê hejmarê ji sedî 42.43'ê kesên mafê dengdanê hene, tev li hilbijartinê bûne. Komisyona Bilind a Serbixwe ya Hilbijartinên Iraqê di 11'ê cotmehê de encamên destpêkê ragihand. Em têkildarî encamên hilbijartinê û nêzîkatiya gel a li dijî encamên hilbijartinê bi Rojnameger Shna Faîq re axivîn. Hilbijartinên li nav kolanên Iraqê... ***Hevpeyvîna Bêrîvan Kayi / R.4***

## Başûr çima Rojava nas nake?

Spanya welatekî dikeve rojavayê Ewropayê. Ji 17 herêm û 2 bajarên xweser pêk tê. Al û paytexta her herêmê cuda ye. Di sala 1978'an de ji bo civak, netew û herêmên xweser bigire bin misogeriyekê makezagonek hatiye sazkirin. Spanya, ne pêkhateyeke federasyonî û ne jî navendî ye. Serwerî bi giştî di destê netewan de ye. Civak xwe bi rê ve dibe. Civaka xweser, li gorî zagonên xwe yên xweser rêveberî û polîtîkayên xwe pêş dixin. Her wiha li gorî bajaran jî rasterast li gorî navçe û şaredariyan jî tê guhertin. Herêmên xweser ên Spanyayê ev... ***Zeynel Bulut / R.8***

## Ev dêr şahida hevgirtina gelan e

Li gundê Derîcîlk ku bi 2 kîlometreyan li bakurê navçeya Tirbespiyê ya kantona Qamişloyê ye, suryan, misilman û êzidî ji demeke dirêj ve bi hev re dijîn. Lê mixabin piştre gelek suryan û êzidî jê koçber bûn. Li bakurê gund, xaça li ser dêreke biçûk a li qada gund hatiye avakirin balê dikişîne. Dêra ku ji dêreke suryanan veguheriye meqsada hemû pêkhateyan ji aliyê şêniyên gund ve tê parastin û malbateke suryan pê re mijûl dibe. Gundê Derîcîlk di serdama borî de rêya sereke bû ku navçeya Tirbespiyê bi gundên herêma Cerah û Aliyan ên gundewarên bakurê wê ve girê dida û tê de Eşû Marûkî El-Suryanî dima. Ji ber şert û mercên dijwar ên piştî qanûna guhertina çandiniyê di dema Cemal Ebdulnasir de (1958-1961), gelek malbatên li herêma Cizîrê diman, xizan bûn û zeviyên xwe ji dest dan. Di encamê de gelek ji wan neçar man ku ber bi bajarên Sûriyeyê yên din ve koçber bibin û hinek jî çûn derveyî welêt... ***R.11***

## Çortan, zêr û kêr

Du siwarê ku barê wan toraq û çortan in ji hêla Mûşê tên diçin Pasûrê, lê li geliyê Mûşê şev bi ser wan de tê û rêya xwe wenda dikin. Heta demekê di cihê xwe de disekinin, paşê dengê kûçikan tê guhên wan û xwe li dengê kûçikan digirin û diçin li ber deriyekî disekinin. Bi dengê hespan re xwediyê malê derdikeve derve. Dinihêre va ye du siwar li ber derî ne. Xwediyê malê dibêje hûn... ***Riza Uyar / R.10***



# Têkoşîn ji bo parastina nirxên civakê ye



Adar Şaman

Di dîroka mêtîngeriyê de yekem car bi ser pîvanên ku civakê tîne gel hev û li hev radigire, êrîş pêk tê. Yek ji rêgeza şerê taybet ji holê rakirina nirxên civakî yên exlaqî û hêza fikrandina polîtîk a kolektîf e. Şerê taybet li dijî civakbûyînê di xizmeta hêzên desthilatdar de bi rê û rêbazên cuda dixwaze tevahiya civakê bixe bin kontrola xwe.

Gelek awayên şerê taybet hene kudivê mirov di ferq û zanabûna wan de be. Tebeqeya serdest di dîrokê de beriya şer tirs ava kirine, bi vê re hêzên xwe yên leşkerî nîşan dane û armanc kirine ku xwe li ser civakan serwer bikin. Di şerê taybet de bedena jinan wek ganimet tê dîtin, civak bi birçîbûnê tê terbiyekirin, teslîm tê girtin, tê xapandin û armanckirina binemaliya-malbatî, şerê derûnî di nav hev de tê şixulandin. Meşandina ziraviya şerê taybet ji bo tunekirina bîra civakî, çand û dîroka mirovahiyê bê berevajîkirin ji yek navendê tê birêvebirin.

**Civak dikare şerê taybet têk bibe**

Şerê taybet çavkaniya xwe ji hişmendiya aqlê serdest ê dewlet-îstîxbaratiyê digire. Dewlet heyîna xwe li ser meşandina şerê taybet bi rêve dibe. Şerê taybet yek ji cureyê şeran ê herî xeternak e. Car heye bi rêya zorê; car jî heye ku xwe bi rêya qanebûn-nerm, kilifa hiqûqa netewe-dewletê û propagandayê bi rêve dibe. Desthilatdarî bi metoda şerê taybet xwe di nava civak û malbatê de bi cih dike.

Rehên civakê xwe dispêre dîroka kûr, hêza wê ya berxwedanê ku her zindî û dînamîk e. Bêyî xwe bispêre hêzeke derve, dikare parastina nirxên xwe, hebûn û destkeftiyên xwe bike. Kesê bi nirxên bîra civaka xwe mezin bibe xwedî bîr û baweriye û qîmeta wê/î bilind e. Qûtbûna ji çand, rastî û dîroka xwe, qebûlkirina çanda xulamtî ya çîna serdest e.

**Kesayetên lewaz!**

Kolonyalîzm dixwaze destpêkê bîr û vîna civakê teslîm bigire; piştre jî ruh, bedena mirov a mîna ku objeyeke bi kar bîne tune bike. Ê ku pergala serdest li ser pêyan digire çanda xulamtî, serçepisandin, tenezûlê hertiştîkirin û sekna peşverû ya kesan e. Desthilatî zemîna xwe ji kesayetên lewaz ên ji rastiya civaka xwe biyanî bûne digire. Kes parçeyek ji nirxên civakî yê/ya herî bi bandor e. Lewra civak xwe di heyîna kes de ava dike, pêre mezin dibe.

**Polîtîkayên şerê taybet**

Ji destpêka avabûna dewletê ve desthilatdarî bi rêya şerê taybet rêxistinbûyîna xwe li ser nirxên bi keda jinan hatine afirandin bi rêve dibe. Civakê li gorî berjewendiyên xwe bi kar tîne. Şerê taybet ji gelek cureyên tundiyê pêk tê. Tevî şerê leşkerî; talana xwezayî, qirkirina fizîkî ya civakê, şerê aborî, xapandin, manîpulasyon, şerê îstîxbarî, perwerdekirina cerdevan-sîxurnotirvan, bêhêvî hiştin, bi rêya fihûşê xistina jin û ciwanan, tecawiz, derxistina şerê navxweyî, ji holê rakirina hêza manewî ya exlaqî, pûçkirina ruhê jiyana komunal û hwd. ji bo xwe dixe armanc.

Ev rêbazên ku me li jorê rêz kirin dewleta tirk ji salên 90'î ve li bakurê Kurdistanê bi her curêyê şerê taybet li dijî kurdên doza azadiyê diparêzin bi kar tîne. Her çiqasî di dem û mekanê cihê de hatibe şixulandin jî lê îro bi heman polîtîkayên qirej dixwazin civaka kurd bi rêya fihûşê biçûk bixin. Bi hezaran mînakên vî şerî yên ser jin û ciwanên kurd pêk hatine hene.

Di van rojên dawî de bi derketina holê ya çeteyên fihûşe/tiryak ku li bajarê Qileban, Colemerg, Gever, Hezex, Êlih û Amedê tê gotin ku ev çete ji hêla cerdevan, polîs û leşkerên bi pere (leşkerên-pispor) ve hatiye organîzekirin. Di hedefa vê çeteya organîzekirî de bi taybetî kurdên di doza azadiyê de bedêl dane, malbatên nirxan û bajarên ku di ferq û zanabûna nasnameya xwe ya kurdewar de dijîn tê xwestin ku di şexsê wan kesan de gelê kurd têk bibin.

**Divê ciwan xwedî alternatîf bin**

Di bin navê qûrsên dirûtin, quranê, pîşeyî û hwd. de jinên ciwan dikişînin nava çirava fihûş û sîxuriyê. Ji bo xistina ciwanên kurd, her cure şerê qirej tê bikaranîn. Ciwan ji çanda xwe têne dûrxistin û bişaftin. Di nav ciwan û zarokan de fihûş û madeyên hişbirê hatiye belavkirin. Desthilatdarî bi vê jî sînordar nemaye, li hemberî ciwanên ketine xefka sîxuriyê gefa kuştine li wan dixwe. Bi taybetî li bajarên Kurdistanê û metropolên ku kurd lê zêde ne ev şêwaz êdî ji rêzê bûne. Jin û xortên ciwan bi rêya şantaj û pere tên xapandin û bi vî awayê tên xistin. Divê ew ciwan vegerin ser nasname û çanda xwe ya resen. Tê xwestin ku ciwanan bi rêya fihûş, bi fêrkirina madeyên hişbir têxin nava çirava pergala modernîteya kapîtalîst û ji wan re tu rêyên alternatîf nehêlin. Divê ev ciwan xwe bê çare nebînin, xwedî alternatîf bin. Ji hêla hestiyarî ve lewazî, valatî hene. Pêwîst e her mirovên kurd mêtîngerê li ser xaka me dijîn baş binasin û xwe ji wan biparêzin. Neçin malên wan û li wesayîta wan siwar nebin.




**Civaka kurd**

Li gorî ku em civaka xwe dinasin; civakek xwedî nirxên giranbiha, zû bi zû nayê xapandin û xwe teslîmî zeîftiyên xwe û lewaziyên şexsî nake, heye. Bi qasî ku em civaka xwe ya kurd dizanin; civakek berxwedêr, esîl, xwedî çand, bawerî û ji bo jiyanek birûmet û azad bi dest bixe, gelek bedêl dane...

Eger ku civak bi rêxistinkirî tev bigere, çendî êrîşên şerê taybet li ser bên kirin jî, wê bi hêza xwe ya rêxistinkirî bikaribe parastina xwe bike û vîna xwe radestî hişmendiya hêzên mêtînger nake. Lê sed mixabin, di van çend salên borî de civak ji hêla rêxistinî ve valatiyeke dijî. Divê bê zanîn, têkoşîn ji bo parastina nirxên civakê ye.

# Efrîn ne bêxwedî ye



Leyla Lorîn

Beriya demekê nivîsgeha jinan û rêxistinên civaka sîvîl a herema Efrînê, sûc û kiryarên çete û dewleta tirk a mêtînger li dijî jinan, ji bo raya giştî ya cîhanê û mirovahiyê, bilançoyek aşkera kiribûn. Di bilançoya nivîsgeha jinan û rêxistinên civakî yên kantona Efrînê de hat zanîn ku ji dagirkeriya Efrînê û vir de 84 jin ji aliyê çeteyan ve hatine qetilkirin, zêdetirî hezarî jin hatine revandin û 6 jin jî 'dawî li jiyana xwe anîne.' Her wiha bi hezaran jin di zindanên Çarxaya Kawa û Kefercanê de di bin îşkence, tecewiz û kuştinê de tên girtin...

Li gorî daneyên Saziya Mafên Mirovan a Kantona Efrînê di meha tebax, îlon û cotmehê de, 301 welatî hatine revandin 25 ji wan jî jin in û 5 ji wan hatin qetilkirin. 50'î hezar darên zeytûnan hatine desteserkirin û 400 hezar dar jî ji kokê ve hatin rakirin û birin Tirkiyeyê. Ev bilonçoya herêma dagirkirî ya Efrînê ya 3 mehên dawî ye ku encamên polîtîkayên dewleta tirk e ku her roj tên dubarekirin.

Di heyameke ku êrîş û gefên dewleta tirk li ser Bakur û Rojilatê Sûriyeyê zêde bûne; li Efrîna dagirkirî çeteyên dewleta tirk lez dane revandina sîvîl, jin û diziya mal û milkên xelkê... Ev kiryarên kirêt ên çetêyan aşkera berdewamiya zihniyeta DAIŞ'ê ye. Çawa ku di 3'yê Tebaxa 2014'an de dewletên serdest û di serî de jî dewleta tirk bi alîkariya hêzên tarî û PDK'ê, çeteyên DAIŞ'ê bera pêsira civaka êzidî dan, vê gavê li Efrînê heman polîtîka ji bo gelê Çiyayê Kurmênc tê kirin. Di wê fermana reş de bi deh hezaran êzidî ji bo nasname, baweriya xwe ya herî kevnar hatin revandin û 5 hezar jinên êzidî jî di sûkên Mûsil, Tela Aferê, Bexda û Reqayê de hatin firotin.

Hîn ev eyba mirovahiyê ji rûyê cîhanê pak nebûye; bi heman zihniyetê çeteyên dewleta tirk, careke din bi destê nokeriya ENKS'ê, li Efrînê rojane sivîl û jinan direvînin û bi şêweyên hovane wan qetil dikin. Li ser xelkê Çiyayê Kurmênc, heyam hatiye wê astê ku jinên ducanî tevî pitika xwe tên qetilkirin! Pirjinî, jinên ciwan bi darê zorê bi pîremêrên heftî salî re têne zewîcandin. Paşê jî milkên wan ji wan têne standin û di bin îşkenceyên giran de têne tecawizkirin û bi trajediyên mezin re rû bi rû dimînin. Divê neyê jibîrkirin ku Efrîn ne bê xwedî ye.

Çeteyên dewleta tirk bi van sûc û kiryarên xwe dixwazin tol û hêrsa binketina çeteyên DAIŞ'ê ya bi pêşengiya şervanên jinên kurd li paytexta ku xelîfe lê hatibû îlankirin Reqayê têk çûn, rabike. Tê zanîn jinên kurd bi lehengî û çelengiya xwe bi rêxistanên xwe ve li dijî hovîtî û pençên çetêyên DAIŞ'ê li rojavayê Kurdistanê, Şengalê, Başûr û Mexbûrê şer kirin û hovên rûpoş ên DAIŞ'ê bi serkeftinên mezin, bin xistin. Jinên kurd bi vê lehengiya xwe mirovahî ji xeteriya reş a DAIŞ'ê rizgar kirin. Ger ku cîhan û mirovahî îro di nava aramiyê de ye, ev yek bi saya lehengiya jinên kurd û şervanên Efrînê ye.

Armanca dewleta tirk, bi van sûc û sepanan, berxwedana efrîniyan bişikîne û çavên xelkê serbilind ên herême bitirsîne. Xelkên ku li ser mal û erdên xwe mayî, hemû bi şêwazê revandin, îşkencekirin, kuştinê bitirsînin û Efrînê bixin hêlîna çeteyên xwe yên hov. Li ser mal û milkên kurdan şer dikin û dixwazin bi temamî li Efrînê cih bibin. Bi gef û êrîşên mihtemel dagirkeriya xwe li heremê mayînde bike. Tê zanîn ku dewleta herî zêde tundî lê heye Tirkiye ye. Em rojane li welatê Tirkiyeyê binêrin, tundî û sûcên dijqanûnî tev li ser kurdan tê meşandin û jinên kurd hedef tên girtin.

Li dijî polîtîkayên qirkirin û sûcên dewleta tirk, her diçe di raya giştî ya cîhanê de, hinek bertek tên pêşxistin. Lê ev helwest têrê nake û lewaz e. Mirovahiya pêşverû, cîhan û gelê kurd divê bi erka xwe rabe û rewşa xelkê Efrînê ji nêz ve bişopînin. Divê bi lez û bez li dijî dagirkerî, qirkirina etnîkî û van sûcên dewleta tirk, şande bên herêmê û lêkolînan bikin. Divê demildest êrîşên ser şêniyên Efrîna dagirkirî bên rawestandin. Pêwîst e dewleta tirk di asta cîhanî de ji ber sûcên li Efrînê pêk tîne, tavilê bê darizandin. Lewma êdî dem hatiye ku hesap ji dewleta tirk werê xwestin.

# Tirsa Talîbanê ya ji jinan

Roja ku Talîbanê dest daniye ser rêveberiya Afganistanê, zextên li ser jinan zêdetir bûn. Derveyî zextan, xizaniya li welat jî her diçe kûrtir dibe. Ji ber sedema zextên li ser jinan û xizaniyê ku heta niha bûye sedema mirina 8 zarokan, jinên afgan bi pêşengtiya Tevgera Jinên Aktîvîst li Kabilê xwestin çalakî lidar bixin. Lê jinên aktîvîs ji aliyê endamên Talîbanê ve hatin astengkirin û destûr nehat dayîn ku rojnameger jî li qadê dîmenan bigirin. Jinan bertek nîşanî talîbanan dan û dest bi çalakiya rûniştinê kirin. Jinan ji ber rojnameger hatin astengkirin bi xwe telefonên xwe dîmen û wêneyan kişandin û bi rêya medyaya dijîtal dengê xwe ragihandin cîhanê.

Jinên çalakî pêk anîn, diyar kirin ku cîhan îşkenceyê ku Talîban li wan dike temaşe dike û wiha gotin: "Ev ji du mehan zêdetir in jin di nava çalakiyan de ne. Li welat bi çalakiyên cuda jinên ku dadiketin qadan li dijî wan qamçiyan bi kar dianîn û îşkence li wan dihat kirin. Lê em serê xwe natewînin û em kesek jî bimînin em ê çalakiyên xwe berdewam bikin."

Her wiha jinên çalakvan dan zanîn ku Talîban li dijî wan tundiyê bi kar tîne û heqeratê li wan dike û ragihandin ku wan tirsa hêzên Talîban a ji jinên afgan di çavên wan de dîtine. **KABUL**



# 'Keştiya Azadiyê' bi rê ket

Navenda Nûçeyan

**Înîsiyatifa ji Ocalan Azadî, bi daxwaza ji Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan re azadî di navbera 8-12'ê mijdarê de çalakiya 'Keştiya Azadiyê' li dar dixe. Ji Yewnanistanê heta Îtalyayê dimeşin**




Înîsiyatîfa 'Ji Abdullah Ocalan re Azadî' bi dirûşma 'Dem hatiye, ji Abdullah Ocalan re azadî, ji Kurdistanê re aştî' kampanyayeke navneteweyî da destpêkirin.

Keştiya ji Ocalan re azadî dê 12'ê mijdarê bigihije Îtalyayê. Ji Almanya, Fransa, Swîsre, Brezîlya, Spanya, Swêd, Îtalya, Yewnanistan û Îngilîstanê wê nûçegihan, akademîsyen, siyasetmedar, nivîskar, nûnerên tevgerên jinan, nûnerên saziyên kurdistanî yên li Ewropayê, hunermend û siyasetmedar bi giştî 50'î kes dê tevli çalakiyê bibin.

Înîsiyatîfa ji Abdullah Ocalan re Azadî diyar kir ku Ocalan dema ku hat Ewropayê Yewnanistan û Îtalya 2 rawestgehên sereke bûn û wiha got: "Rêbertî beriya 23 salan 12'ê mijdarê ji ber ku hatibû Îtalyayê Înîsiyatîfê plansaziya wê daniye ku bi navê 'Keştiya ji Abdullah Ocalan re Azadî' dê 12'ê mijdarê li Îtalyayê be."

Der heqê naveroka bernameyê de Înîsiyatîfê ev agahî da: "Di çarçoveya kampanyaya 'Dema wê hatiye, ji Abdullah Ocalan re azadî, ji Kurdistanê re aştî' de armanca 'Keştiya ji Ocalan re azadî', di navbera 8-12'ê mijdarê de, di roja pêşî ya bernameyê de li Yewnanistanê komploya navneteweyî nîqaş bike. Pişt re di gera 3 rojan a keştiyê de kesên ku tevli gerê bûne dê paradîgmaya Abdullah Ocalan, felsefeya wî û kampanyaya Înîsiyatîfa Ji Abdullah Ocalan re Azadî nîqaş bikin û ramanên Abdullah Ocalan bigihînin her kesî.

Herî dawî 12'ê mijdarê ew roja ku Ocalan gihîştibû Îtalyayê, dema ku keştî bi gihîje perava Napolî ya Îtalyayê bi hezaran dostên îtalî wê keştiyê pêşwazî bikin. Pişt re dê bi bernameyên siyasî û çandî bi dawî bibe."

Bernameya keştiya ji Rêber Ocalan re azadî wiha ye:

*Li Yewnanistanê bername dê 8'ê mijdarê dest pê bike. Çalakger li vir wê bi rêxistinên civaka sivîl û partiyên siyasî re hevdîtinan bikin.

*Êvarê li Atînayê têkildarî komploya li ser Abdullah Ocalan dê panêlek were lidarxistin.

Cih: Stavropolou 33 Ayhens. Saet 18:00.

*Li kampa penaberan a Lavrîo ya Yewnistanê dê bernameyeke çandî were lidarxistin.

Cih: Danoukara1 Lavrîo. Saet: 21:00

*9'ê mijdarê keştî ji Yewnanistanê dê ber bi Îtalyayê ve biçe. Li perava li Yewnanistanê dê mîtîngek û civîna çapemeniyê were kirin.

*Dema gerê wê du bername çêbibin. Der heqê tecrîda li Îmraliyê û paradîgmaya konfederaliya demokratîk û 'Kampanyaya ji Ocalan re azadî' de çalakiya bernameya agahdarkirinê û bernameyeke çandî were kirin.

*Keştî 12'ê mijdarê dê bigihîje Îtalyayê û li peravê dê bi mîtîngekê were pêşwazîkirin.

# MED-DER: Divê siyasetmedarên kurd ziman biparêzin

Navenda Nûçeyan

Komeleya Lekolînê ya Ziman û Çandên Mezopotamyayê (MED DER) di sala 2017'an de bi armanca perwerde û pêşxistina zimanê kurdî li Amedê hat avakirin. Li ser zimanê kurdî xebatan dike. Bi zaravayên kurdî yên kirmanckî, kurmancî û soranî perwerdeyê dide. Li ser ziman bi saziyên civakî re jî hevkariyê dike.

MED-DER ne tenê li polan, her wiha li ser platforma zomê jî perwerdehiya zimanê kurdî dide. Hevseroka MED-DER'ê Şîlan Elmas têkildarî xebatên komeleyê û polîtîkayên dewletê yên li dijî ziman ji rojnameya me re axivî. Elmas li ser MED-DER'ê diyar kir ku ew dewama KURDÎ-DER'ê ye û wiha got: "Me nav guharî lê naverok û armanc me yek e."

**Hişmediya ziman ava dikin**

Şîlan Elmas li ser xebatên MED-DER'ê rawestiya û wiha axivî: "Armanca me ya sereke ew e ku em di nava civakê de hişmendiya ziman ava bikin û parastina ziman pêş bixin. Li vir xebatên herî girîng perwerdeya ziman e. Sazî û dezgehên ku dixwazin fêrî zimanê kurdî bibin kar û xebatên xwe bi kurdî bikin divê serî li MED-DER'ê bidin. Di sala 2020'î de Platforma Zimanê Kurdî û Tora Çand û Zimanê Kurdî dest bi kampanyaya îmzayê kirin. Di vê xebatê de derket holê ku ên li ser navê kurdan siyasetê û xebata kurdî dikin, divê teqez bi zimanê herêma xwe bizanibin. Ji ber vê yekê HDP'ê biryar da ku parlementer, şêwirmend, endam û xebatkarên xwe bi zimanê xwe perwerde bikin. Ji meclîsa HDP'ê 450 kesan serî li MED DER'ê dan. Perwerde ji 2 beşan pêk tê. Yek ji wan li Enqereyê, ya din jî li Îzmîrê çêbû. Girîngîya Îzmîrê ji ber Deniz Poyraz bû. Ji ber vê yekê me xwest di kesayeta wê de li wir perwerdeyê bidin. Hevalên li Îzmîrê spasname girtin hemû tirk bûn. Hewildan û eleqeya wan pir bala me kişand."

**MED DER'ê pol vekirin**

Elmas li ser xebatên MED-DER'ê yên li Amedê rawestiya û ev tiş anî ziman: "MED-DER bi saziyên civakî re hevkariyê dike. Ma muzîkê bi piştgiriya MED-DER'ê 23'ê pol vekir û zarokan perwerde dike. Li şaxa Egîtîm-Sen'ê polek, li TMMOB'ê polek, li şaxa SES'ê polek û li Komeleya Koçberiyê (GOÇ-DER) jî poleke me heye. Bi rêya onlînê perwerdeya me didome."

**Bi navên cuda xebatan dimeşîne**

Şîlan Elmas anî ziman ku MED DER bi navê cudatir li bajarên din jî xebatên xwe dimeşîne û wiha berdewam kir: "Niha li Êlih, Semsûr, Wan û Cizîrê xebatên ziman hene. Me li Farqînê nûnertî vekir. Em ê li navçe û bajarên din jî li gorî pêdivî û derfetên xwe hêdî hêdî qadên ziman vekin."

Elmas li ser polîtîkayên dewletê jî rawestiya û wiha dirêjî da axaftina xwe: "HDP di hevdîtina butçeyê de mijara pir zimaniyê anî rojeva meclisê. Lê desthilata AKP'ê mijarê guhert. Desthilata AKP'ê perwerdeya ziman wekî mafên mirovan nabîne. Li cihekî mîna Amedê navên tax û dibistanan diguharîne. Li cihekî din jî Wezareta Perwerdehiya Neteweyî (MEB) dibêje 'Me ji bo zimanê kurdî qûrs vekiriye. Dewlet bi xwe re dikeve nakokiyan. Li cihekî zimanê kurdî tune dike, li cihê din jî dibêje em perwerdeya zimanê kurdî didin."

**Divê xwedî li ziman derkevin**

Elmas herî dawî xwest kesên li ser ziman siyasetê dikin divê bêtir ziman biparêzin û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Kesên parastina ziman û xebatên ziman dikin dirûtiyên dewletê qebûl nakin. Zimanê me zimanekî rewa ye. Em ê ziman li dijî polîtîkayên wan ên qirêj biparêzin. Kesên li ser navê kurdan xebatan dikin divê ji me bêtir û çêtir li ziman xwedî derkevin. MED-DER di her astê de perwerdeyê dide. Ji asta destpêkê heta mamostetiyê didome. Zarok, ciwan û her kes perwerdeya ziman dibîne. Bila jî bo mamostetiyê serî li MED-DER'ê bidin. Dem û saetên perwerdeyê li gorî şagirt û mamosteyan tê guhartin. Em dixwazin her kes li zimanê xwe xwedî derbikeve. Xwe û zimanê xwe biparêz e."

## Di dema AKP'ê de 23 hezar karker mirin

Meclisa ÎSÎG'ê, diyar kir ku di dema desthilatdariya AKP'ê de 28 hezar û 380 karkeran jiyana xwe ji dest dane. Meclisa ÎSÎG'ê rapora der barê cînayetên kar ên karkeran ya navbera salên 2002-2021'ê de aşkera kir û got: "Di dema desthilatdariya AKP'ê de li Tirkiyeyê ji bo karkeran tiştek neguheriye. Di dema desthilatdariya AKP'ê de 28 hezar û 380 karkeran jiyana xwe ji dest daye." ***ENQERE***

## Dayikên Aştiyê li Wanê meclis ava kirin

Dayikên Aştiyê yên Wanê li avahiya HDP'ê ya Wanê bi şahiyekê meclisa xwe ava kirin. Parlamenterên HDP'ê, rêveber û endamên HDP, DBP, TJA, TUHAY-DER, Dayikên Aştiyê yên Amedê jî tev li şahiyê bûn. Dayikan bi rêzgirtinê dest bi bernameyê kirin. Ewil hevseroka HDP'ê ya Wanê Handan Karakoyun axivî û diyar kir ku dayik li vî welatî nûnerên aştî û demokrasiyê ne û her dem li dijî şer li kolanan têkoşîna xwe berdewam kirine. Li ser navê Meclisa Dayikên Aştiyê ya Amedê Nafya Yîgît jî anî ziman ku dayik bi salan in bi înat têdikoşin û



xwest ev têkoşîn bibe wesîleya aştî, demokrasî û azadiyê. Yîgît bi bîr xist ku di şer de herî zêde dayik êşê dikişînin. Parlamentera HDP'ê Dîlan Dirayet Taşdemîr jî anî ziman ku ew bawer dike ku avakirina Meclisa Dayikên Aştiyê dê bibe wesîleya aştî, azadî û demokrasiyê. Piştî merasimê endamên Meclisa Dayikên Aştiyê ya Wanê yek bi yek xwe dan nasîn. Piştî îlanê endamên TJA'yê qurnefîlên spî û laçikên spî li dayikan belav kir. ***WAN***




## 'PKK'ê ji lîsteya terorê derxin'

Navenda Nûçeyan

Siyasetmedar, nivîskar, filozof, aktîvîstên aştiyê, parlamenter, hiqûqnas û hunermend jî di nav de 29 kesên navdar, 'Însiyatîfa Edalet ji bo Kurdan a Navneteweyî' ava kirin. Xwediyê Xelata Nobelê Elfriede Jelinek, Fîlozof Slavoj Zizek, Pisporê Hiqûqa Navneteweyî Prof. Norman Paech, Sekreterê Giştî yê EUTCC'ê Prof. Michael M. Gunter, ji damezrînerên Rêxistina Dayikên Plaza de Mayo Nora Cortinas jî tev li Însiyatîfa Edalet ji bo Kurdan a Navneteweyî bûn. Însiyatîfê ji bo PKK ji nava lîsteya terorê ya Yekîtiya Ewropayê (YE) bê derxistin dest bi kampanyayekê kir. Însiyatîfê ragihand ku li gorî pêvajoya heyî û rastiyên li ber çavan, divê PKK ji lîsteyê bê derxistin û got: "Ji bo aştî, demokrasî û mafên mirovan em bang li Konseya Yekîtiya Ewropayê dikin ku PKK'ê ji Lîsteya Rêxistinên Terorê derxîne." Înîsiyatîfê anî ziman ku çareseriya aştiyane û siyasî ya pirsgirêka kurd şertê destpêkê yê pêkhatina demokrasî û aramiya li Tirkiye û Rojhilata Navîn e û wiha cih da daxuyaniye: "Her şer rojekê bi çareseriya siyasî bi dawî dibe. Ev rastî ji bo şerê ku dewleta tirk li dijî kurdan dike jî derbas dibe. Çareseriya aştiyane û siyasî jî bi diyalogê û danûstandinan dibe. Pêvajoyeke gengaz a diyalogê û danûstandinan divê PKK (Partiya Karkerên Kurdistanê) jî di nav de bi beşdariya hemû aliyan pêk were. Lê belê bicihkirina PKK''ê li lîsteya rêxistinên terorê bi tena serê xwe li pêşiya diyalog û danûstandinan asteng e. Pêvajoya heyî û rastiya objektîf ferz dike ku PKK ji lîsteyê bê derxistin. Ji bo vê jî gelek pratîk û hincetên hiqûqî hene.

## Komên çeteyan 14 sivîl revandin

Çeteyên Feyleq El-Şam a girêdayî Hêzên Çekdar a tirk, li gundê Îska yê girêdayî navenda bajarê Efrînê ya dagirkirî, 14 sivîlên ku di nava wan de jin jî hene revandin. Çavkaniyên heremî yên Efrînê ragihandin ku çeteyên Feyleq El-Şam 14 sivîl revandine. Şêniyên hatin revandin wiha ne: Mihmed Elî Osman (24), Hesen Îbo Îbiş (50), Bekir Nûrî Berekat (30), Selha Nûrî Selha (40), Fadil Ebdulrehman (30), Welîd Hayder Mamo (45), Mesûd Îbrahîm Mamo (40), Ednan Omer Îbo (56), Cemal Mihmed Alo (35), Ehmed Macid Remo (35), Hesen Samî Bazur (23), Bineyş Omer Îbiş (50), Esûm Omer Îbiş (50), Bişûr Sibhî (30)." ***EFRÎN***

## DIVÊ PDK Û YNK BI HEV RE BIGIHÎJIN ENCAMEKÊ

# Beriya hilbijartinê kursî parvekiribûn

Bêrîvan Kayi

*Hilbijartina pêşwext a parlementoya Iraqê di 10'ê cotmehê de hat li darxistin. Li seranserî Iraq û Herêma Kurdistanê 23 milyon 986 hezar 741 kesan mafê wan ê dengdanê hebû. Lê li gorî komîsyona hilbijartinê aşkera kir ji vê hejmarê ji sedî 42.43'ê kesên mafê dengdanê hene, tevli hilbijartinê bûne. Komisyona Bilind a Serbixwe ya Hilbijartinên Iraqê di 11'ê cotmehê de encamên destpêkê ragihand. Em têkildarî encamên hilbijartinê û nêzîkatiya gel a li dijî encamên hilbijartinê bi Rojnameger Shna Faîq re axivîn.*



Bidestxistina dengek zêde ji aliyê namzetên jinan ve xeberek dilxweş e. Jixwe her tim kêmbûna parlementeriya jinan cihê rexneyê bû, bi rastî di vê helbijartinê de jin karibûn hejmara kêm derbas bikin

**Piştî hilbijartinên Iraqê rewşa dawî ya siyasî çawa ye?**

Piştî hilbijartinê li nav kolanên Iraqê nerazîbûn û alozî heye, ji ber di nav gel de hîsek hatiye afirandin ku di hilbijartinê de sextekariyek (fêlbaziyek) bi plan hatiye kirin û li gorî wê hilbijartin bi encam bûye. Ji ber vê guhertinek ber bi çav li gorî hilbijartina dema borî derketiye holê. Mînak, aliyê (tifaqa) Sadir di hilbijartina 2018'an de 54 kursî bi dest xistibû lê di vê hilbijartinê de kursiyên wan zêde bûn û 73'ê kursî bidest xistin, ev yek jî ne dihat texmînkirin.

Ew aliyên ku nêzîkî Tehranê bûn dengê wan kêm kirin û li hemberî vê aliyên nêzîkî Amerîka û Tirkiyeyê jî dengên wan heya radeyeke ber bi çav zêde kirin.

Wisa xuyaye ku dê pirsgirêk heta piştî avakirina hikûmetê jî berdewam bikin. Li gorî rewşa heyî avakirina hikûmetê jî hinekî zehmet e. Bi taybetî ji bo avakirina hikûmetê hê ji niha ve du senaryo derketine holê.

Yekem; aliyê (tifaqa) Sadir ku zêdehiya dengan bidest xistiye bi lîsta Muhamed Helbusi re ye ku ew jî partiyek sunî ye û duyemîn kom e ku dengên zêde bidest xistiye. Mînak, li gel PDK û çend aliyên din ên biçûk bikarin hikûmetekê pêk bînin. Lê ger hikûmet bi vî rengî were avakirin hikûmetek recifok (lerzuk) dê derbikeve holê û ji hikûmetên pêşiya xwe baştir dernakeve holê. Çawa? Ji ber nikarin bertekên li kolanan razî bikin.

Duyem; ev ji aliyê lihevkirî û parvekirinê hem ji aliyên kursiyên zêde bidest xistine û hem jî ji aliyên ku şikestinek zêde bidest xistine di vê hilbijartinê de.

Ger ku avakirina hikûmetê li ser bingeha lihevkirinê nebe û saziyên şiî û Heşdî Şabî razî nekin, em ji bîr nekin ku xelkê dadikevin kolanan tenê ne sîvîl in. Hêzên çekdar û Heşdî Şabî jî di nava wan de hene û ew her gava ku bixwazin dikarin aloziyeke wiha mezin derxin da ku hikûmet mecbûr bimîne gavê paş de biavêje. Ji ber vê alozî dewam dike. Li gorî nêrîna min ger ku hikûmet bi dengê zêde serkeftinê bi dest neyne dê di demeke nêz de têk biçe.

Bi nêrîna min ev hikûmet bi vî awayî pêk nayê û dê alozî jî dewam bike. Heta lihevkirinek siyasî di navbera herdû aliyên nêzîkî Îran û nêzîkî Amerîkayê de çênebe hikûmet ava nabe.

**Tevlibûna hilbijartinê ji sedî 30 kêmtir bû, li gor qanûna Iraqê hewce bû hilbijartin bihata betalkirin. Lê rewş ne guherî. Ev rewş dê bandoreke çawa li Iraqê bike?**

Erê rast e, yek ji wan sedeman sextekarî ye. Lê beşdarnebûyîna gel û boykota dengdayînê yek ji sedemên herî bi bandor e ku gumana sextekariyê heye. Dibêjin bandora sextekariyê li ser zêdebûyîna hejmaran zêde ye. Boykota hilbijartinê bû sedema ku hejmara hinek ji wan aliyan zêdetir bibe. Gel di vê hilbijartinê de dengê xwe kêm da. Lê komîsyona giştî ya hilbijartinê hejmara dengan zêde kir û got ku ji sedî 42 di vê hilbijartinê de deng daye. Ev hejmar ne rast e.

Di dema ragihandina tv û medyayê de pir bi hêsanî derdiket holê ku gel çiqasî çû ser sindoqên dengdanê. ji sedî 30'î kêmtir bûye. Komîsyona giştî ya hilbijartinê ji bo ku rasteka wê nîşan bide gotiye hilbijartin ji sedî 42 ye.

Li Iraqê tiştek wiha nîne, ger rêjeya dengan kêm be girîngiyê nadi hilbijarinê. Welatek weke Iraqê ew çend pirsgirêk, nakokî û qeyran heye û destên ji derve li ser hakim in û welatên ji derve li ser Iraqê biryar didin ji ber vê yekê ev tişt normal in û lihev kirine. Ji bo gel jî zelalbû ku ev hilbijartin ji aliyê welatên derve û hatiye plankirin. Ji ber ku texmîn nedikirin ku ev hilbijartin hilweşe. Ev mesele di referanduma Başûr de hat tecrubekirin. Bi giştî di Iraqê de jî wiha ye, êdî ji wan re ne girîng e ku gel çiqasî neraziye û ev hilbijartin çiqas bi dilê gel dibe yan nabe. Jixwe di destpêkê de kursiyên hilbijartinê di nava xwe de belavkiribûn û dixwazin xwe û berjewendiyên xwe li ser axa Iraqê biparêzin. Ev tişt jî bandorek mezin li ser gelê Iraqê dike û gel bi vî awayî bêdeng namîne û dibe sedem ku hikûmetên ku pêk tên li Iraqê hikûmeteke demkurt be.

**Sedema herî bingehîn a ku gel neçû ser sindoqan çibû?**

Gel çima neçû ser sindoqên hilbijartinê, xelk neraziye, gel bê îradekiriye, gel bêhêvî kiriye, di demê derbasbûyî de li hemû hilbijartinên ku xelk tev lê bûne de, dîtin ku dengdan li nav Iraqê guhertineke dirust nake, ew hêzên ku xwe wek muxalefetê bi nav dikirin û gel deng didan wan, em dibînin ku çawa beşdarî hikûmetê bûn, ew jî bûn beşek ji desthilatê. Ji ber vê ew aliyên muxalefetê îradeya gelê Iraqê pûç kir. Bi taybetî ez herêma Kurdistanê mînak bidim; hîzba weke Goran çend deng bidest xist, li parlementoya Kurdistanê destpêkê 25 kursî û piştre jî 24 kursî bidest xistibû û li parlementoya Iraqê jî xwedî 4 kursiyan bû, di vê hilbijartinê de qet kursî bidest nexist. Baş exelkê ji ber çi xwe paşde kişand? Ji ber ew aliyên muxalefetê piştî beşdarî desthilatê bûn, bûn parçeyek ji desthilatê, gel ji vê ders girt, dît ku tu alî nikare li gel xelkê bicih bibe û pirsgirêkên wan çareser bike. Ji ber vê çareserî tenê di neçûyîna ser sindoqan de dîtin.

**Sedema zêdekirina dengên Partiya Sedir û Yekgirtiya Îslamî çi bûn?**

Ji bo çi dêngen Sedir zêde bûn? Hizba Sedir, hizbekî populîst e. Li ser hestên gel dilîze û amadekariyeke pir baş kir ji bo ku di vê hilbijartinê de dengên xwe zêde bike. Lê qet texmîn nedihat kirin ku dengên wî bigihêje asta niha. 54 kursiyên xwe zêde kir û bû 75 kursî. Sedir berdewam xebata xwe li kolanan meşandiye. Xwe weke hêzeke nerazî nîşan da û berdewam piştgirî da çalakiyên gel û her wiha xwe weke pêşengê wan çalakiyan nîşan da, ji bo wê hertim xwest xwe wekî aliyê gel nîşan bide.

Lê aliyê din tê gotin saxtekariyeke bi plan û bername kiriye ku hejmarên dengên xwe zêde kiriye.

Sebebek din a boykota hilbijartinê, dengên xwe yên sabît hene û bi berdewamî dîsa diçin ser sindoqan. Lê xelkên nerazî neçûn ser sindoqan û dengê xwe bikar neanîn. Ji ber vê yekê di dawiyê de hizb û aliyên siyasî ku dengê wan sabît in qezenc kirin.

Sedir yek ji wan hizban e ku dêngdêrên wî sabît in. Her wiha sextekarî û çalakiyên ku çêbûn, bû sedem ku Sadir di hilbijartinê de dengê xwe zêde bike.

**Piştî hilbijartinan rewşa Başûr di çi astê de ye û di navbera PDK-YNK'ê de aloziyek heye?**

Bi kurtasî piştî hilbijartinê milmilaneya (rekabet) di navbera her du partiyên başûrê kurdistanê PDK û YNK'ê de derdikevin holê. Ger em van herdû partiyan binirxînin, ji ber ku herî zêdedengên PDK û YNK'ê hene. Bi taybetî PDK'ê di vê hilbijartinê de kursiyên xwe zêde kir û ji 28 kursiyan derxist 34 kursiyan û hejmara kursiyên YNK'ê jî kêm bûn. Dengê YNK'ê jî di vê hilbijartinê de kêm bû û daket 16 kursiyan. Parlementerek serbixwe tevli hilbijartinê bûbû paşê tevli YNK'ê bû û bi giştî kursiyên YNK'ê bûn 17. her wiha ferqeke mezin ket navbera YNK û PDK'ê. Lê ev herdû alî ji ber ku di berjewendiyên hevpar de li gel hev in, mirov dikare bibêje ew nikarin bi berdewamî li ser esasê hejmara kursiyan têkiliyan bi hevre deynin. Her wiha me di demên derbasbûyî de jî dîtibû hem li herêma Kurdistanê û hem jî li Iraqê ev herdû partî nikarin li ser zêdebûn an jî kêmbûna kursiyan nêzîkatiyê li gel hev çêbikin û hikûmetê ava bikin. Ji ber ku berjewendiyên wan hevpar in, neçar in li ser hevpariyan hikûmetê pêk bînin. Niha jî herî zêde pirsgirêka van herdû aliyan li ser postê serokkomariyê ye, postê serokkomariyê li gorî lihevkirina di nav YNK û PDK'ê de ye, postê serokkomariyê yê YNK'ê ye, li hember wê jî postê serokê herêma Kurdistanê jî ji bo PDK'ê ye. Di dema hilbijartina 2018'an de jî heman tişt bû.

Heman pirsgirêk di sala 2018'an de di navbera du aliyan de pêk hatiye lê di dawiyê de YNK bi ser biketiye. Ji ber ku di parlamentoya Iraqê de deng zêdetir bi dest xist, nûnerê PDK'ê ku Doktor Fuat Hisên bû, bi bin ket û Doktor Berhem Salîh bi ser ket.

Lê vê carê wisa xuya nake ku li ser zêde û kêmkirina dengan tiştek erênî bikin, ji ber ku di nava YNK'ê de jî pirsgirêk û aloziyek zêde heye. Îhtîmal heye ku nikaribin dengek zêde di parlamentoya Iraqê de bigirin, ji bo wê neçare bi PDK'ê re bibe yek. Halbûkî esasê rêketina pêşî dibû deng ji bo YNK'ê bûya. Lê niha PDK neraziye bi taybetî li ser diyarkirina namzetiya Doktor Berhem Salih ji bo posta (cih) serokkomariya Iraqê kêşeya (pirsgirêk) wan zêde ye, ji ber wê posta serokkomarî ji bo YNK'ê dibe. Lê dibe kesê ku YNK ji bo serokkomariyê diyar dike tenê ji bo YNK'ê nebe, belkî ji bo PDK û YNK'ê be.

Pêwîst e ku PDK nerazîbûna xwe nîşan bide, ji bo wê jî çend namzet diyar kirine. Îhtîmala wê heye ku posta serokkomariyê bigire, lê YNK heta niha li ser wê meseleyê negihîştiye encamekê. Wisa xuyaye ku ev post careke din ji bo Doktor Berhem Salîh bi dest bixe.

**Bi giştî 97 jin ketin parlamentoya Iraqê û kotaya ji sedî 25'an derbas kirin. Bandora jinên siyasetmedar dê li ser siyaseta Iraqê çawa be?**

Bidestxistina dengek zêde ji aliyê namzetên jinan ve xeberek dilxweş e. Jixwe hertim kêmbûna parlementeriya jinan cihê rexneyê bû, bi rastî di vê helbijartinê de jinan dikaribû hejmara kêm derbas bikin.

Lê tiştekе metirsîdar heye ew jî ev; hêviyek tune ku jinên çûne parlementoyê bikaribin bandoreke baş li ser jinan bikin, ji ber ku endamên hîzbên di parlamentoyê de cih digirin û li gorî berjewendiyên hizbên xwe tevdigerin. Ne wekî jinan çûne parlamentoyê. Lê dîsa jî bi hêviya ku bi alîkariya saziyên jinan bikaribin bandoreke erênî li ser wan bikin da ku jin li parlamentoyê werin gel hev û hêzek çê bikin û bandora wan li ser jinan hebe. Her çend heta niha tiştekî berbiçav nekirine, ji ber ku heya niha jinên ku çûne parlamentoyê projeyek wan ya berbiçav ji bo jinan tune bû. Lê em bi hêvî ne ku di pêşerojê de bi alîkariya saziyên jinan dê bikaribin guhartinekê çêbikin.

# Wateya têgehan a rastîn û girîngiya vegotinê



Adar Jiyan



Sedema gelek gengeşî, arîşe û lêkdanên civakî yek jê wateya şaş û ya din jî vegotina şaş a der barê têgihan de ye. Heta ku vegotineke rast pêk neyê, têgihiştineke rast pêk nayê. Heke vegotin tune be, têhgihiştin jî tune ye. An na tu kes nizane ka kî li ku derê çi difikire, çi dixwaze yan dixwaze çi bibêje.

Di tevahiya gerdûnê ya yekpare de çi heyîn û heyberên ku hene bi hev re di têkiliyê de ne. Ji bo têgihiştina vê têkiliyê û rastiya wê, pêdivî bi watedarkirinê heye. Watedarkirin jî bi derbirîn û vegotinê pêkan dibe. Ev têkilî, hin caran bê navgîn û rasterê û hin caran jî nerasterê û binavgîn pêk tê. Di dijbêjîya (diyalektîka) vê têkiliyê de rastî ev e ku hemû heyîn û heyber, hem bandorê li hevdû dikin û hem jî ji hevdû bandorê digirin. Ji bo têgihiştina vê têkiliyê jî pêdivî bi watedarkirina têgihan a rastîn heye. Ji bo têgihiştina watedarkirina têgihan a rastîn jî pêdivî bi vegotineke rastîn heye.

Lêkolîn û dahûrandinên zanistî yên der barê têgihên ku bi hezaran sal di bîr, binhiş û hişmendiya mirovahiyê de bi cih bûne, rastiyeke din bi ber me dixin. Delîl û daneyên zanistî, gelek têgihên ku wekî dijwate û dijber hatine binavkirin jî vê yekê piştrast dikin ku gelek têgih, heyîn û heyberên dijwate, hem dijberê hev û hem jî temamkerê hev in. Wekî nimûne; başî û xerabî, tarîtî û ronahî, şer û aştî, dostanî û dijminahî û hwd. Hemû bi dijberê xwe tên nasîn û binavkirin. Heke yek ji wan tune be teqez a din jî tune ye. Her çiqas wekî dijberê hev werin dîtin û binavkirin jî ew tu caran bêyî hevdû pêkan nabin û nikarin hebûna xwe bêyî hevdû temam bikin.

Çi stêrk, gerstêrk û heyînên ku di valahiya fezayê de cih digirin; çi hebûnên ku li gor tevgera gerdûnê ya yekpare di nav kêşanê de ne û çi jî bûyer, karesat û lêqewmînên ku di bin sîwana asîman de li gor qanûna xwezayê pêk tên hemû bandorê li hevdû dikin. Bi kurtayî hemû tiştên heyî têkildarê hev in. Hin tişt jî li gor vê têkiliyê tên binavkirin û watedarkirin. Ji van tiştên heyî hin jê dijwate, hin jê dijber û hin jê jî temamkerê hev in. Ji van tiştên dijwate û dijber yek jê jiyan û ya din jî mirin e. Her çendî ku jiyan û mirin wekî du bûyerên dijwate û dijber bêne dîtin jî ew bi hev re pêk tên û hebûna xwe bi hev re dikudînin. Gava ku jiyan tune be mirin jî tune ye. Mirin bi jiyanê re diwelide û jiyan bi mirinê diqede. Tovê mirinê di jiyanê de veşartî ye; an ku mirin heya dawiya temenê heyînê candar bi jiyanê re dijî. Di encama lêkdanê de mirin bi ser dikeve û jiyan têk diçe yan jî bi dawî dibe.

Hemû têgihên ku rasterê dijberê hevdû ne, di nav lêkdanek misoger û misêwa de ne. Wateya tiştî jî li gor vê dijberiyê tê dayîn. Ne pêkan e ku peyveke dijwate û têgiheke dijber bêyî dijberê xwe bi tena serê xwe pêk were. Ji bo wê; tu heyîn, heyber û têgihên dijwate nabe ku ew bêyî dijberê xwe were zanîn, nasîn û binavkirin. Bo nimûne; başî li gor xirabiyê, ronahî li gor tarîtiyê, mezinahî li gor biçûkatiyê, têrbûn li gor birçîbûnê, xweşî li gor nexweşiyê tê binavkirin

Hin heyîn, heyber û têgihên dijwate jî hene ku ne dijmin û ne jî dijberê hev in; bervajî wê, temamkerê hev in. Erd û asîman, şev û roj, mêyîtî û nêrîtî, jinîtî û mêrîtî û hwd. wisa ne. Di navbera wan de têkiliyeke erênî û temamker heye. Ango ne dijmin û ne jî dijberê hev in. Hebûna yekê dibe sedema hebûna ya din. Lê ev rêbaz her gav ji bo hemû tiştên din ne derbasdar e.

Hin heyîn, heyber û têgihên dijwate û dijber jî hene ku ew hem sînorê hevdû diyar dikin, hem jî ji hevdû re dijmin in; ji hev dixwin û hevdû têk dibin. Wekî mînak; şer û aştî du bûyerên wisa dijwate û dijber in. Ji ber ku wateya şer li gor aştiyê û wateya aştiyê jî li gor şer tê dayin, dijberê hev in û di navbera wan de lêkdaneke bivênevê û domdar heye. Di encama vê lêkdanê de yek zora yê din dibe yan jî yek li yê din dadigere. Ev rêbaz ji bo hemû dijberên din jî derbasdar e.

Hin heyin, heyber û têgih jî hene ku hem dijwate, hem dijber û hem jî temamkerê hev in. Hin taybetiyên mirov ên dijwate û dijber wisa ne. Başî û xirabî, wêrekî û newêrekî, camêrî û çikûsî, hevxemî û bêxemî, durustî û durûtî û hwd. dijberê hev in. Ji ber ku ev taybetî wateya dijberê xwe diyar dikin, dijwate; ji ber ku li dijî hev in dijberê hev; ji ber ku herdû jî bi hev re pêk tên temamkerê hev in. Lewre, yek ji wan tune be, ya din jî tune ye. Hemû taybetiyên mirovan ên erênî û neyînî wisa ne. Ev rêbaz jî ji bo hin tiştan derbasdar, ji bo hin tiştan ne derbasdar e.

Çi di têkiliyên kesane yên di navbera mirovan de dibe û çi jî di têkiliyên civakî yên di asta ragihandinê de dibe; vegotin xwediyê rol û risteke pir girîng e. Wateya têgihekê ya rastîn bi têgihiştineke rastîn; têgihiştinek rastîn jî encax bi vegoitineke rastîn mumkun dibe. Tiştê ku wate û watedarkirina têgihê hêsan û pêkan dike vegotina rastîn e. Vegotina rastîn, mirov ber bi têgihiştineke rastîn; têgihiştineke rastîn jî mirov rasterê ber bi rastînî, riya rast û heqîqetê ve dike.



Ahmed Kanî

## Term: Awêneya sosyolojiya kurdan

Romana kurdî, di nava edebiyata kurdî de roj bi roj weka stêrka sibehê diçirise û digihîje asteke wisa ku êdî meriv dikare romanên kurdî li gorî temayan bisinifîne. Ez dixwazim di vê nivîsa xwe de li ser romana Hisên Kemal a bi navê "TERM"ê rawestim û wê di nava romanên tarza klasîk a cîhanê de bi cih bikim. Roman awêneya sosyolojiya kurdan a pêncî sal berê ye.

Nivîskar Hisên Kemal xwe spartiye folklora kurdî. Di serê romanê de wiha nivîsiye; "Heta ku ez li jiyanê bim, her ku min bi wî zimanê te hînî min kir, çîrokek bihîst, her ku di qiseteкê de navên Hz. Elî, Seyîd Betalê Xazî, Mem, Zîn, Siyabend, Xecê, lawikê Zembîlfiroş, Edûl, Dewrêş… bihurîn, her ku birîneke axa min hat gotin, her ku tiliyên min li kompîturê ketin û li pey hevdû di monîturê de peyv rêz kirin… Bes te ji bîr nakim dayê."


Cîhana romanê, li ser kuştina Habîlî ji aliyê birayê wî yê bi navê Qabîl ve bi vegotin û we'izên Mele Emerê Hafizî hatiye avakirin. Serdar bi xweşikî, başî û qenciya xwe dişibe Habîl ê ku ji aliyê Qabîl ve hatiye kuştin. Silêman jî bi kirêtî, nebaşî, bênamûsî û kujeriya xwe dişibe Qabîl ê ku birayê xwe Habîl kuştiye. Di navbera Habîl û Qabîlî de jî doza başî û nebaşiyê heye, li vir jî heman tişt heye yan bi gotineke din dualîzm heye. Cih/mekanê romanê, ji sê gundan (Berindir, Qanax û Sancax) ber bi sê bajaran (Amed, Riha û Semsûr) ve, berbelav dibe. Dema wê jî salên 1970'yan e ku Serdar jî wek şoreşgerên wê demê bi navê telebeyên ku bi kurdperwerî tên nasîn, tê pênasekirin.

Mijara romanê êş, mirin û kuştina navxweyî ye. Dîsa nivîskar di serê romanê de, mijar wiha pêşkêş kiriye: "Li gorî dîrokzan, filozof û mirovên biaqil, ev welat, welatê mirinê bû, bes mirinê li vî warî reh diavêt û ew şîn dibû.

Wan mirovên zana nedizanî, jîn û mirin li vî warî, ne du rastiyên dijber û dûrî hevdû bûn, gelekî nêz bûbûn. Bi hezaran sal bi xwarina hevdû xwedî dibûn, yekê xwîn dida ya din, yekê ya din dimijî."

Nivîskar, di gera xwe ya li Semsûrê de, li ber deriyê mizgeftekê pîreke (Siltan) parsek a diranek di dev de mayî dibîne. Çîroka xwe li ser vegêrana vê pîrê dihone. Ev şêwe honandina romanê, wek sahneyeke sînemayê ji dawiya çîrokê dîmenekî dide xwîner, meraqa xwîner zindî dihêle heta ku bi flashbekan ji serê çîrokê ber bi dawiyê ve dihone. Di navenda çîrokê de, Serdar û Silêman cih digirin. Malbata Serdarî, ji eşîra ûsikê ya li serxetê û binxetê belavbûyî pêk tê. Malbata Silêmanî jî li navçeyên Bêsnî û Semsatê yên bajarê Semsûrê dijiyan. Bavê Silo Awzer, axayê gundê Qanaxê di hefsê de, bi Çoloyê ji eşîra beşikan, re hevnasîbû. Bo muxtariyê şer di navbera eşîra wî û ya emeran de derdikeve. Di wî şerî de li gundê Sancaxa Qerejdaxa Sêwregê, du mêran dikuje. Awzer jî bi kuştina mamosteyekî tirk ê ku navê bênamûsiyê pê ketiye, tê tewanbarkirin. Ew merivek mêrxas û comerd bû. Wî karekterê kurê xwe Silo ne dieciband, sedema neecibandina wî jî nexweşikbûna Siloyî hatiye nişandan.

Di romanê de gelek çîrokên cuda cuda cih digirin. Wek mînak Îso, kurê biçûk ê Teyarê ûsikî dema li Îzmîrê leşker e, keça dozgerekî tirk bi navê Menekşe (Binefş), dibe aşiqê wî. Pê re direve tê nava eşîra ûsikiyan. Kekê Îso, Nûh, mezinê malbatê mehra wan li hev dibire û wan dişîne binxetê, cem ûsikiyên li wê derê. Dozgerê bavê Binefşê salixê wan ji Pirsûsê digre. Hêzeke mezin a leşkerê tirk dişîne ser ûsikiyan. Nûho hemû eşîra xwe, çi li serxetê çi li binxetê komî ser hev dike. Bi awayeke rêk û pêk berxwedaneke mezin nîşan dide. Dewlet wek her gav bi dek û dolaban Nûho dide girtin. Lê Nûho Îsa yê birayê xwe û bûka xwe Binefşê nade dest. Di vê bûyerê de nivîskar xwestiye peyama ku dema kurd bi tifaq bin, dijmin nikare bi wan re derkeve serî. Bi bûyerên hevkuştinê jî peyama lewazbûna kurdan daye xwîner.




Di romanê de behsa qira ermeniyan jî hatiye kirin. Teyarê ûsikî, Garbîsê fileh û malbata wî ji qirkirinê rizgar kiriye. kurê Garbîs Hecî Behram qenciya bavê Nûho ji bîr nekiriye. Dostekî baş ê Nûho ye, dema xebera wendabûna Serdarî tê bihîstin, ji bo salixan jê bigire dikeve nav hewldaneke mezin. Li Amedê ji nas û dostên xwe pirsa Serdarî dide kirin.

Karekterên sereke yên romanê, Serdar kurê Bozan e. Ji Gulîzera keça Temoyê hevalê Awzerî hez dike. Xalê Serdar Nûho jî rêberê malbata xwe ye. Çolo, diya wî Xensê û hevjîna wî Eyşê cihek mezin di romanê de girtine. Awzer, hevjîna wî Zubêdeya keça elewî ku bi saya pîrekî elewî pê ra zewiciye. Zubêde hewl dide ku zarokên xwe di dibistanên dewletê de bide xwendin, lê bi ser nakeve. Ez bawer dikim ku ev roman têra xwe balkêş e.

Di encamê de ez dikarim bibêjim ku ev roman, romaneke realist e. Xwendina wê herikbar e. Ji Weşanxaneya Wardozê, di gulana 2021'ê de derketiye.

# Şengal 6 sal in xwe diparêze

Navenda Nûçeyan

**Piştî YBŞ û YJŞ hat avakirin li Şengalê ewlehî û aramî pêş ket û Şengal jî ji destê DAIŞ'ê rizgar kirin. Hêzên parastinê di bin banê Meclisa Xweseriya Demokratîk a Şengalê de hatin komkirin**



DAIŞ'ê di 3'yê Tebaxa 2014'an de bi ser Şengalê de girt û komkujî pêk anî. Ji ber pêşmergeyên PDK'ê parastina Şengalê nekirin û ji Şengalê reviyan, DAIŞ'ê komkujî kir û Şengal vala kir. Bi hezaran Şengalî qetil kirin û dîl girtin. Çeteyên DAIŞ'ê di êrişê de tecawiz, zor, tundî û îşkence li mirovan kir. Jin ber çavên zarok û hevjînên wan kuştin. Jin li bazaran wekî amûran li welat û bajaran hatin gerandin û firotin. Di her kêliyê de îşkenceya fizîkî û derûnî li wan hat kirin.

Piştî DAIŞ'ê êrîşî Şengalê kir û dagir kir, rêveberiya PKK-KCKê demildest ji raya giştî re ragihand ku biryar dane gerîla bişînin hawara civaka êzidî. Di heman şevê de tabûrên gerîla ber bi herêmê ve ketin rê. Her çend Şengal ji çiyê dûr bû jî 12 gerîlayên HPG'ê û YJA-Starê tevî hemû zor û zahmetiyan berê xwe dan Şengalê. Navenda Parastina Gel (NPG) ewil 12 gerîla şand hawarê. Ji 12 gerîlayan 3'ê ji aliyê asayîşa PDK'ê ve hatin girtin û 9 gerîla gihîştin qadê. Van gerîlayan li qadê demildest plansaziya xwe çêkirin. Plan kirin ku dê her yek ji wan deriyekî çiyê bigire, hem şengaliyên ku berê xwe dane çiyê biparêzin, hem jî bergiriya DAIŞ'iyan bike ku nekaribin bikevin çiyê û qirkirinên mezintir pêk bînin. Gerîla, beşek ciwanên êzidî bi rêxistin kirin û li dora xwe kom kirin. Bi lez û bez dest bi parastinê kirin.

**Korîdora mirovî**

Li aliyê din hêzên YPG-YPJ'ê li Bakur-Rojhilatê Sûriyeyê li dijî DAIŞ'ê şer dikirin, bêdeng neman û wan jî mudaxaleyî çeteyên DAIŞ'ê kirin. Piştî hêzên gerîla gihîştin qadê şervanên YPG-YPJ'ê li dijî DAIŞ'ê şer kirin û axa Til Koçer, Cezaa û Rebîa ji destê DAIŞ'ê rizgar kirin. Sînorên Sûriye-Iraqê derbas kirin. Xwe gîhandin hawariya civaka êzidî. YPG-YPJ'ê di 5'ê tebaxê de sînor derbas kirin û ketin navçeya Rebîa ya li pêşberî Til Koçerê û DAIŞ li Rebîayê têk birin. Ji rêzê ve gundên Tawis, Qaîle û Mehmûdiye ku 15 km dûrî Rebîa ne ji DAIŞ'ê rizgar kirin. Gav bi gav pêş de çûn û xwe gihandin çiyayê Şengalê. Korîdoreke mirovî vekirin û êzidiyên ji ber hovîtiya DAIŞ'ê xwe spartî çiyê, di korîdorê re derbasî rojavayê Kurdistanê kirin.

Piştî şervanên YPG'ê gihîştin çiyê gerîlayên HPG-YJA STAR'ê jî xwe gihandin çiyayê Şengalê.

**Şervanan mil dan hevûdu**

Şervanên HPG'ê di 5'ê tebaxê de yekîneyên xweparastinê bi navê Yekîneyên Berxwedana Şengalê (YBŞ) bi rêxistin kirin. Bi hezaran keç û xortên êzidî mil dan milê şervanên HPG'ê û li dijî DAIŞ'ê şer kirin. Hêzên YPG-YPJ û HPG'ê di 2 rojan de di korîdarê de 120 hezar kes ji çiyayê Şengalê derbasî Rojava kirin. Rêveberiya Xweser a Rojava ew pêşwazî û hembêz kirin. Şervanên HPG-YJA Star, YPG-YPJ û YBŞ'ê di meha kanûnê de derbên giran li DAIŞ'ê xistin. Gundên Ramalla, Qedaa, Kenho yên li Başûrê Cezaa ku li ser xeta korîdora Şengal-Rojava, dîsa gundên weke Remmo, Recm Abed, Xazuga û Naiyyem ên li aliyê Iraqê diman, ji çeteyan rizgar kirin.

**Gaveke dîrokî**

Di 29'ê cotmeha 2015'an de hemû hêzên parastina êzidxanê gaveke dîrokî avêtin. Bi daxuyaniyeke hevbeş, bi dirûşmeya "Fermandariya Êzidîxan a Ji Bo Rizgariya Şengalê" fermandariyeke hevpar ragihandin. Di 21 û 22'yê kanûna 2014'an de dest bi operasyona rizgarkirina Şengalê kirin. Lê ji ber nakokiyan nîvco ma. Fermandariya Şengalê 12'ê Mijdara 2015'an careke dîtir mizgînî da civaka Êzidî û tevahiya gelê kurd ku 'Operasyona Rizgarkirina Şengalê' dane destpêkirin. Operasyon bi pêşengiya gerîla, hêzên parastina Êzidxanê, xelkê êzidî yên li çiyayê Şengalê li ba şervanan mayî, di dorhêla xweparastinê de tevli operasyonê bûn. Roja ku operasyonê dest pê kir, hêzên kurd ketin nava tevgerê û gihîştin navenda bajarê Şengalê. Di roja duyemîn de hêzên YBŞ-YJŞ û HPG-YJA Starê beşeke girîng a navenda bajêr rizgar kirin. Piştî pêvajoyeke berxwedanê ya 11 mehan a HPG û YBŞ'ê bajarê Şengalê rizgar kirin. Koordînasyona Şengalê di 14'ê mijdara 2015'an de li navenda Şengalê daxuyanî da û mizgîniya rizgariya Şengalê da. Li hêzên HPG-YJA Star, YBŞ, YPJ-Şengal, HPŞ û Pêşmergeyan ku di nava şer de cih girtibûn pîroz kir. Piştî vê pêvajoyê di meha cotmehê de bi armanca ku êdî YBŞ li herêmê rêkûpêkî û yekrêziya xwe çêbike bi pêşengiya fermandarê YBŞ'ê Berxwedan Tolhildan (Ednan Silêman) ku 24'ê çileya 2015'an de di êrîşeke DAIŞ'ê de jiyana xwe ji dest da, civînek hat lidarxistin. Di vê civînê de Meclîseke Leşkerî ya Şengalê hat avakirin. Di 5'ê hezîrana 2015'an de komeke jinên êdzidî bi civînekê Yekîneyên Jinên Şengalê YJŞ ava kirin.

Di 20'ê kanûna 2014'an di dorhêla duyemîn pêngava rizgarkirina gundewarên Şengalê de komalgehên weke Dihola, Sinûnê, Dugur, Xanesor bi pêngaveke berfireh hatin rizgarkirin. Pişt re di 20'ê sibata 2015'an de pêngava rizgarkirina gundewarên derdorê li herêmên Xanesor, Barê, Çiyayê Kolîk, hatin destpêkirin. Di vê pêngavê de gundên Serhedok, Faw Zeko, Hesawî hatin rizgarkirin.

**Pirsgirêk li meclisê çareser dibin**

Piştî YBŞ û YJŞ hat avakirin li Şengalê ewlehî û aramî pêş ket û Şengal jî ji destê DAIŞ'ê rizgar kirin. Hêzên parastinê di bin banê Meclisa Xweseriya Demokratîk a Şengalê (MXDŞ) de hatin komkirin. MXDŞ di çarçoveya xebatên civakî de navenda bajarê Şengalê jî tê de li her komalgeh û gundên wê meclis û komunên gel ava kir. Di van meclisan de civak bi rêkûpêkî li hev dicive û pirsgirêkên xwe guftugo dike û jê re li gorî derfetan li çareseriyê digere. Tevahiya saziyên Şengalê bi şêwaza hevserokatiyê xwe rêxistin kiriye û bi rêve dibe.

# Pêşmergeyê Dêrîn: PDK bi daxwaza Tirkiyeyê şer derdixe



Pêşmergeyê Dêrîn Mihemed Kerîm ê ji Germiyanê têkildarî şerxwaziya Partiya Demokrata Kurdistanê (PDK) ya li hemberî gerîlayên azadiyê, axivî. Mihemed Kerîm ê bi çavê xwe malwêraniya şerê navxweyî dîtiye, şerê PDK li dijî gerîla dike weke şerê Tirkiyeyê pênase dike û weke dardest û mertalên leşkerê tirk dibîne.

Mihemed Kerîm diyar kir ku niha jî bermayiyên şerê navxweyî maye û wiha got: "Ev şer şerekî nayê xwestin e. Wê gelê kurd ji vî şerî gelek zererê bibîne. Ev şer ne bi xwesteka kurdan, bi xwesteka Tirkiyeyê ye. Tirkiye zextê li PDK'ê dike, ew jî ji ber berjewendî û mayîna xwe pêk tîne."

Kerîm bal kişand ser rola gerîla û axaftina xwe wiha domand: "Eger gerîla nebe, Kurdistan jî wê nebe. Ji ber ku gerîla xeta sor a Kurdistanê ye. Ên ku gerîla bifiroşin û şer li gel bikin dê di roja dawî de zererê bibînin. Ji ber ku ji nav gel rabûne û gel li pişte. Îro be yan jî sibê be dê gerîla bi ser bikeve. Encama şer jî malwêranî, birçîbûn û qirkirin e."

Pêşmergeyê Dêrîn Mihemed Kerîm di dawiya axaftina xwe de ev tişt anî ziman: "Desthilata PDK'ê ne bi destê xwe ye. Eger Erdogan ferman bide, neçare şerê gerîla bike. Ger ferman neke nake. Ji ber ku ev ne şerê PDK'ê ye, şerê Tirkiyeyê ye, PDK mertala li ber leşkerê tirk e." ***HEWLÊR***



Xweşkanî

Felemez Ulug

# Rejîma AKP û MHP'ê pêşiya xwe nabîne

Ev demeke Erdogan û wezîrên wî di her firstê de derdikevin pêşberî kamerayan û gefa li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dixwin. Bêgûman sedemên van gefan û zimanê êrîşkariyê ji ber lewazbûna rejîma AKP û MHP'ê ye.

Erdogan di serdema desthilatdariya xwe de, her pêvajoya ku tengav bû karta şer derxist pêş. Di van salên dawî de şirîkê wî yê bicûk jî bi heman têgehê tevdigere. Jixwe ew hertim alîgirê şerê bi kurdan re bû. Lewma ev gefên Erdogan ji milekî ve dilê wan jî xweş dike.

Di gelek platformên cuda de êrîşên muhtemel ên li ser Rojava tên nîqaş kirin. Li ser van gefên êrîşkariyê jî herkesê ku mijarê dinirxîne balê dikşîne ser helwestên Amerîka û Rûsyayê. Wisa diyare ku herkesî hêviya xwe bi van dewleta ve girêdaye û li bendêne ku ji bo silametiya herêmê destûr nedin dewleta tirk ku êrîş bike. Ji ber ku ev hêzên hegemon bi her awayî xwe li ser herêmê ferz dikin, dibe ku heya radeyekê ev nêzîkatî jî rast be. Lê divê em ji bîr nekin ku şoreşa Rojava şoreşa gelan e. Lewma di vir de îrade û nêzîkatiya gelan ji her aliyê de girîng û bi wate ye. Ji ber vê yekê dema em nirxandinên xwe dikin divê em nêrîn û helwesta gelan jî bi heman girîngiyê bigrin dest.

Bêgûman Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi hemû pêkhateyên xwe ve li dijî van gefan radibin. Di vê mijarê de li welat û derveyî welat gelek xebatên hêja jî hatin meşandin. Lê divê li hemberî van gefên dewleta dagirker gel bê amadekirin. Bersiva herî xurt wê ev be.

Ji aliyê din ve ji bo di qada navneteweyî de statuya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bê naskirin xebat bên meşandin. Biryara parlementoya Katalonyayê ji bo dema pêş mînakeke baş e. Bi naskirina statuya Rojava wê dawî li darigkeriya dewleta tirk û gefê wê were.

Tecrûbeya ku me bi dewleta tirk a dagirker re jiyaye nîşan dide ku gefên li ser herêmê jixwe hene. Rast e Erdogan û kabîneya wî ya şer ji bo ji krîza heyî xwe rizgar bikin gelek caran rojevê diguherînin lê divê em mijarê cidî bigrin dest û li gor wê tevbigerin.

Ger di mijara Rojava de Erdogan û alîgirê wî di çarçoveya ku dixwazin êrîşekê nikaribin pêk bînin, wê berê êrîşên xwe bidin guhertin. Lewma dibe ku li şûna Rojava êrîşê bibin ser Herêmên Parastinê yên Medyayê jî. Her çendî li herêmên Zap, Avaşîn û Metînayê şerekî giran diqewime jî diyare dewlata dagirker ji bo şerê hîn mestir çavê xwe sor kiriye.

Ji bo li herêmê vî şerî pêş bixe ji xwe re hin hevalbend jî avakirine. Li Rojava ENKS li Başûr jî PDK bûne xulamê wê. Ev tevgerên ku berjewendiyên xwe yên şexsî ji yên neteweyî mezintir dibînin bi her awayî bûne xulamê dewleta dagirker. Lewma dewleta tirk berya ku li ser herêmê êrîşekê pêk bîne dilê neyar xweş dike. Wisa diyare ev herdû alî jî ji bo êrîşên nû amade ne.

Bi van êrîşan rejîma AKP-MHP'ê hewl dide xwe li ser postê desthilatdariyê bigre. Lê ji ber ew jî baş dizanin rê li wan tengbûye pêşiya xwe baş nabînin. Ji ber vê yekê tezkereya ku salane dihat qebûlkirin vê carê kirin du sal. Êdî Erdogan û şirîkên wî jî dizanin her diçe wenda dikin. Ji ber wê ye ku tim dixwazin mijara şer di rojevê de bihêlin. Lê ji ber rewşa welat ya xerab êdî mîna berê di vê mijarê de jî ji bo xwe hevalbendên ku pê piştras bibin nabînin. Ev hemû xewn û xiyalên wan vala derdixe. Lê divê ev neyê wateya ku wê êrîş nekin ango hovîtiyekê nekin.

# Li ser gefên nû yên li dijî rojavayê Kurdistanê

Dildarê Amedê

Li gorî şîrove û analîzên ku tên kirin armanca sereke ya dewleta tirk ji van gefan ew e ku tevliheviyê di vê herêma bi ewle de bike. Dixwaze xelkê herêmê bitirsîne û wan ji cih û warên wan bike. Ji aliyê leşkerî ve êrîşeke wiha ya vegirtina Rojava bêyî destûra hêzên navneteweyî ne pêkane û li gorî agahiyên li ber destên me Erdogan erêkirin û razîbûna hêzên navneteweyî negirtiye. Hêzên leşkerî yên Sûriyeya Demokratîk amade ne ji bo ku bersivê di aliyê leşkerî de bidin. Ev çend roj in ku dewleta tirk bi rêya medyaya xwe li dahola şer dide û dibêje ku ew dê dest bi êrîşeke din a li dijî Rojava bikin. Wek tê zanîn armanca sereke tirsandina sivîlan e da ku cih û warê xwe terk bikin û dixwazin tevliheviyê bixin nava gelên herêmê.

Lê ew nayê wê wateyê ku hikûmeta tirk dê dest bi şerekî nû neke. Ew xwe neçar dibîne ku berê gelê Tirkiyeyê ji ser krîza aborî û pirsgirêkên civakî yên li nava Tirkiyeyê veguherîne. Lewra jî dibe ku macerayeke wiha bike û tevliheviyeke nû li herêmê derxe.

**Armanc tunekirina destkeftiyan e**

Bêguman yek ji armancên sereke ya hikûmeta tirk ew bû ku hemû destkeftiyên kurdan têk bibe. Di wî warî de bi rêya hin peymanên bi hêzên navdewletî re hin bajarên kurdan ên wekî Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî dagir kir. Lê bi hatina Joe Biden û guhertina siyaseta rayedarên Amerîkayê re hin astengî li pêşiya wê armanca hikûmeta tirk çêbûn. Li vir divê em xebatên dîplomasiyê yên kurdan û di serî de Rêveberiya Xweser û Meclisa Sûriya Demokratîk jibîr nekin. Dîplomasiya kurd roleke mezin di guhertina siyaseta DYA'yê ya li herêmê de lîst.

**Rûsya çavê xwe digere**

Ji aliyê din ve Rûsya jî êdî naxwaze deverên din bikevin destê dewleta tirk û li wir bibe xwedî hêzeke ku di pêşerojê de pirsgirêkan ji bo berjewendiyên wê yên li Sûriyeyê jî derxîne.

Lê em ji bîr nekin ku ev gefên hikûmeta tirk herî zêde li hesabê Rûsyayê jî tên. Rûsya dixwaze ku hikûmeta tirk van gefan zêde bike da ku Rûsya û rejîma Şamê şert û mercên xwe li ser Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ferz bikin.

Rûsya her dem çavên xwe ji zextên dewleta tirk ên li dijî kurdan digire û heman tiştî ji bo êrîşên Israîlê yên li ser milîsên Îranê jî dike. Rûsya naxwaze kesek bihêz li wir hebe da ku nebin taluke ji bo berjewendiyên wê yên li Sûriyeyê. Rûsya dixwaze ku hemû deshilata Sûriyeyê di bin baskê wê de be.



**Bangên diyalogê**

Gelek caran Rêveberiya Xweser ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê amadebûna xwe ya ji bo diyaloga bi rejîma Sûriyeyê re dubare kiriye. Herî dawî beriya çend rojan dîsa endamê komîteya hevserokatiya PYD'ê Aldar Xelîl banga diyaloga bi rejîmê re dubare kir. Xelîl, da zanîn ku ew amade ne diyalogê bi rejîma Şamê re bikin.

Heta niha hikûmeta Şamê bi rengekî cidî û aqilane nêzî bangên diyalogê nebûye, bersiva rejîmê her dem teslîmgirtine û dixwaze di bin zextan de bazara xwe bike. Rejîm a dixwaze ku rewş vegere wekî beriya 2011'an êdî ev tiştekî pir zehmet e.

Bêguman kurd jî qebûl nakin ku rewş vegere wekî beriya 2011'an û destkeftiyên xwe yên bi xwîna bi hezarên şehîdan ji dest berdin.

**Ger Rûsya bixwaze…**

Lê di her halî de wisa dixuyê ku dawiya dawî dê çareseriya hemû pirsgirêkên Sûriyeyê tenê bi lihevkirinên navxweyî guncav be. Her wiha tiştê ku bi tenê bikaribe pêşî li dagirkirina axa Sûriyeyê jî bigire ev rêya bi tenê ye.

Heke Rûsya bixwaze dikare rejîma Sûriyeyê li ser maseyê bide rûniştandin û heke rejîm û Hêzên Sûriyeya Demokratîk li ser peymanekê li hev bikin, ew dikarin li kêleka hev hemû axa Sûriyeyê ya dagirkirî rizgar bikin.

Tenê peymanek û lihevkirineke wiha dikare dawiyê li van gefên hikûmeta tirk bîne ku her dem têne dubarekirin.



# Bertekên li hemberî çekên kîmyewî didomin

Navenda Nûçeyan

Li cîhanê ji salên 1600'î heta niha dewletan di şer de gelek caran li dijî hev çekên kîmyewî bikar anîne. Rêxistinên navneteweyî ji bo bikaranîna çekên kîmyewî bêne qedexekirin peyman dane îmzekirin. Ligel ku heta niha gelek caran peyman hatine îmzekirin jî dîsa dewletan li hemberî hev çekên kîmyewî bikar anîne û sûcên şer kirine.

Tirkiye di gelek êrîşên xwe yên li ser kurdan, gelek caran çekên kîmyewî bikar anîne û heta niha jî tîne. Li ber çavê cîhanê di êrîşên Serêkaniyê û herî dawiyê jî li herêmên Zap, Metîna û Avaşînê bikar anî. Bi meha ne ku li hundir û derveyî welat gel, sazî, siyasetmedar, akademisyen, nivîskar li hemberî bikaranîna çekan bertek nîşan dan û hê jî ev çalakî li gelek ciyan didomin.

**Ber bi OPCW'ê ve meşiyan**

Kurdistaniyên li Ewropayê dijîn, li dijî çekên kîmyewî ku Tirkiye ji 23'yê nîsanê ve di êrîşên li ser Herêma Kurdistanê bikar tîne, li ber Dîwana Edaletê ya Navneteweyî ya Neteweyên Yekbûyî (NY) a li bajarê Lahey ê Hollandayê civiyan. Kurdan bikaranîna çekên kîmyewî ya Tirkiyeyê protesto kir û piştre heta ber Rêxistina Qedexekirina Çekên Kîmyewî ya NY (OPCW) meşiyan. Kurdistaniyan ji OPCW xwestin ku heyetekê bişîne Herêma Kurdistanê ku Tirkiye lê çekên kîmyewî bikar tîne.

**Koalîsyon hat avakirin**

Hefteya borî li Îngilîstanê Koalîsyona li Dijî Çekên Kîmyewî hat avakirin. Koalîsyonê diyar kir ku dê di rojên pêş de heyetekê bişîne Herêma Federe ya Kurdistanê û bi nûnerên PDK, YNK û rayedarên Sefaretxaneya Îngilîstanê re hevdîtinan bike. Heyet armanc dike ku li herêma çekên kîmyewî lê hatine bikaranîn lêkolînan bike. Heyet piştî lêkolînan dê raporê amade bike û pêşkêşî Neteweyên Yekbûyî ya li Cenevreyê bike. Koalîsyonê bang li NY û Rêxistina Qedexekirina Çekên Kîmyewî (OPCW) û saziyên din kir û xwest li dijî sûcên Tirkiyeyê dest bi lêkolînê bikin û bêdeng nemînin.

**Îngilîstanê fosfor firotiye Tirkiyeyê**

Koalîsyonê da zanîn ku hikûmeta Îngilîstanê 70 lîsansên çekên kîmyewî yên fosfora spî jî tê de hene dane Tirkiyeyê û Îngilîstan wek hevkarê êrîşên çekên kîmyewî binav kir û got: "Tirkiyeya endamê NATO'yê li dijî gelê kurd gaz û çekên kîmyewî dibarîne. Bêdengiya Îngilîstanê nayê qebûlkirin. Divê bi lez hemû peymanên bi Tirkiyeyê re kirine betal bike û firotina çekan a Tirkiyeyê rawestîne. Ev şer li dijî gelê kurd e. Tirkiyeyê aşkera kiriye ku çekên kîmyewî stok nake. Lê em dibînin ku di êrîşa li dijî Kurdistanê de çekên kîmyewî bikar tîne.

# Net Zero 2050'î çi ye?



Kurdistan Lezgiyeva

Gelek kesan armancên pêşketina domdariya Neteweyên Yekbûyî û Peymana Kesk ku ji hêla welatên rojavayî ve hatiye pêşxistin bihîstiye. Lê bi rastî her kes fêm nake bê ka Neteweyên Yekbûyî ji bo çi van armancên gelemperî dişopîne. Guherîna avhewayê dê bandoreke çawa li mirovên cîhanê bike?

Xwediyê Xelata Aştiyê yê Nobelê û Şêwirmendê berê, Sekreterê Giştî yê Neteweyên Yekbûyî Rei Kwon Chang, mijara guherîna avhewayê baş dizane. Wî konsepta "Net Zero 2050'î" bi daxwaza heta sala 2050'iyan emîsyonên karbonê daxe sifirê pêş xist. Rei Kwon Chang li Rûsyayê li ser mijara guherîna avhewayê axiviye lê performansa wî di "Festîvala Zanistî ya Tev-Rûsya" de bi aşkera ji çarçoveya ragihandinê wêdetir, bi gelek daxuyaniyên zelal bala her kesî kişand.

Chang di destpêka axaftina xwe de diyar kir ku ji bo di atmosferê de heta sala 2050'iyan emîsyonên karbonê bigihîjin sifirê hûn dê nikaribin xwe bispêrin zanista kevneşop. Ji bo vê yekê pêwistiya we bi zanisteke nû heye. Piştre di domdariya axaftina xwe de diyar kir ku zanist tenê ne teknolojî ye; ji bo wî di heman demê de zanistên civakî rasterast ji zanistên xwezayî girîngtir in.

Li gorî Chang, şaristaniya me li ser sotemeniyên fosîl û pir erzan avabûye. Berê me guh nedida gazên karbonê yên li atmosferê ku bandorê li avhewayê dikin. Lê niha guhertinên avhewayê û nemaze zêdebûna germahiyê gihîştiye asteke bilind. Ev yek divê neyê paşguh kirin ji ber ku hebûn û mayîna mirovahiyê dixe xetereyê.

Jixwe hertim wiha bû,"şerên petrolê" jî îspata van in. Lê pêngaveke wiha ya manîpulatîf a Chang bi tu awayî ne tesaduf e. Ev yek dê bêtir ji axaftina wî aşkera bibe. A duyemîn jî rola sereke ya bandora antropogenîk a li ser avhewayê ye. Chang ji hêla xwerû ve ye, lê hê jî zanyaran li ser dînamîkên bilindbûna germahiya atmosferê lihev nekirine.

Chang hewl da ku ji guhdarvanan re rave bike ku "Net Zero 2050"î paradîgmayeke nû ye. Piştî Joe Biden bû Serokê Dewletên Yekbûyî û dest bi kar kir, Chang ji bo pêşketina mirovî hêzeke nû wergirt. Rewşa nexweşiya COVID-19'ê jî sedemeke din bû. Yanî bi gotineke din dibêje ji qaîdeyên kevin ên "kapîtalîzma bazara azad" û ji girtina mîqdarên mezin ên hîdrokarbonan dûr bikevin, da ku êdî di bihayê dawîn de lêçûnên karbonê werin hesibandin. Li gorî wî aboriya bazarê ya "pêşveçûna domdar" dê bi vî rengî xuya bike. Chang di çarçoveya axaftina xwe de navê "aboriya avhewayê" li "pêşveçûna domdar" kiriye. Paşê Chang daxuyaniyeke din a bi deng da û dibêje vîrusên nû neçar in derkevin holê, bi taybet li welatên sar.

Di aboriya bazara azad a heyî de, Chang angaşt dike ku pirsgirêka avhewayê wekî lîstika 'zeroyê' ye. Divê hertim yekî wenda bike hebe. Dema hewcedarî bi dayîna bermayiyên karbonê çêdibe, qezenc kêm dibe. Ji ber vê yekê tu welat bi xwe li kêmkirina gaza karbonê negeriyan ji ber ku ev yek dê Berhema Navxweyî kêm bike. Ji ber vê yekê, divê mirov 'pirsgirêka avhewayê' veguhezîne lîstikeke karîger a erênî ji ber ku dê her kes di nav tariyê de be, hem avhewa û hem jî aborî.

Paşê Chang berê xwe da teknolojiyê. Ew difikire ku deryayek mezin a fersendê heye ku cîhanê dekarbonîze bike. A herî girîng jî pêşxistina rêyeke aborî ya ji bo derxistina hîdrojenê ye. Wî got hikûmet û pargîdaniyên taybet hewl didin di hilberîna hîdrojenê de bibin pêşeng. Ji ber ku enerjiya hîdrojenê erzantir e. Hîdrojen dê bibe alîkar ku di navbera avhewa û aboriyê de lîstikeke pozîtîf bileyîze.

Bi rastî dema mirov guh dide daxuyaniyên bi vî rengî mirov dikeve vedîtineke wiha; ew kesên ku rojeva gerdûnî ji cîhanê re weke talîmatê vedibêjin, gelek caran ne bi lêkolînên zanistî, lê bi helwestên xwe yên îdeolojîk ku tevahiya wan zanistên xwezayî paşguh dikin tên rojevê. Rei Kwon Chang ji sala 1991'ê û vir ve li ser pirsgirêkên avhewayê dixebite û di nav sazî û dezgehên Neteweyên Yekbûyî de ye. Bi van nêzîkatiyên xwe aşkera ye ew ne bi tenê bû. Lewra fikir û ramanên wî di stratejiya Neteweyên Yekbûyî de cih digirin.

Weke encam; mijara têkoşîna li dijî guherîna avhewayê bêtir rojeva beşek ji elîta siyasî û karsaziya cîhanê ye, ne ji ber metirsiyeke rastîn a li ser mirovahiyê ye.

# Başûr çima Rojava nas nake?

Zeynel Bulut



Spanya welatekî dikeve rojavayê Ewropayê. Ji 17 herêm û 2 bajarên xweser pêk tê. Al û paytexta her herêmê cuda ye. Di sala 1978'an de ji bo civak, netew û herêmên xweser bigire bin misogeriyekê Makezagonek hatiye sazkirin. Spanya, ne pêkhateyeke federasyonî û ne jî navendî ye. Serwerî bi giştî di destê netewan de ye. Civak xwe bi rê ve dibe. Civaka xweser, li gorî zagonên xwe yên xweser rêveberî û polîtîkayên xwe pêş dixin. Her wiha li gorî bajaran an jî rasterast li gorî navçe û şaredariyan jî tê guhertin. Herêmên xweser ên Spanyayê ev in: Endulus, Valencia, Katalonya, Giravên Balear, Giravên Kanarya, Galicia, Bask, Madrid, Asturias, Cantabria, Murcia, Navarra, La Rioja, Aragon, Castilay Leon, Castilla La Mancha û Extremadura. Dema mirov li pergala Spanyayê ya xweseriyê dinêre, ev di hişê mirov de derbas dibe; Cîhana ku mirov dikaribe lê bijî ev der e. Bi taybetî jî em kurdên ku bi salan in têkoşîna azadî û demokrasiyê dimeşînin. Her tim siyaseta kurd a li bakurê Kurdistanê û Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ev modela Spanyayê pêşniyarî dewleta tirk kiriye.

17 herêmên xweser ên Spanyayê li pêşberî hev û mafên hev bi rêzdarî tev digerin, hebûn û mafên hev nas dikin û bi awayekî aştiyane bi hev re dijîn. Spanya ji rojavayê Kurdistanê bi qasî 4 hezar û 700 km dûr e. Bi balafirê derdora 5-6 saetan dem di navbera wan de heye. Di 20'ê cotmehê de Parlamentoya Katalonyayê Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê (Rojava) naskir. Her wiha parlementerên Katalanyayê gotin ji bo tevahiya Spanyayê Rojava nas bikin dê mijarê bibin Parlementoya Spanyayê jî. Ev ji bo me kurdan cihê kêfxweşî û şanaziyê ye. Lewra gelê kurd bi dehan salan e têkoşîna azadî û statuya xwe didin. Kurdistana ku bi Lozanê kirine çar parçe ev sed sal e li her parçeyekî Kurdistanê têkoşîna demokrasî û azadiyê û bi dest xistina statuyê tê meşandin. Li Iraqê kurdan di sedsala 20'î de ji bo xweserî û serxwebûna xwe li dijî rejîma Baas şerekî mezin kirin. Li ser kurdên Başûr polîtîkayên pişaftinê hatin meşandin, di serî de Enfal û Helebçe komkujiyên bi çekên kîmyewî û gelek komkujî pêk hatin. Lê piştî hilweşîna rejîma Baas a dibin serserweriya Saddam Huseyîn de di sala 2005'an de hikûmet û dewleta Iraqê bi awayekî fermî Herêma Federal a Başûrê Kurdistanê nas kir. Ev jî ji bo me kurdan cihekî kêfxweşî û şanaziyê bû.

Li parçeyekî din ê Kurdistênê jî di encama berxwedan û têkoşîneke bêhempa li pêşberî berdêlên giran statuyek hatiye bi dest xistin. Em qala rojavayê Kurdistanê dikin. Wekî her kes dizane di adara 2011'an de li Sûriyeyê alozî derket. Rejîm û muxalefeta li Sûriyeyê li dijî hev şerê çekdarî meşandin. Piştî van bûyeran kurdên rojavayê Kurdistanê di 19'ê Tîrmeha 2012'an de li Kobanê dest xweparastinê kirin. 19'ê tîrmehê bû despêka şoreşa Rojava. Li gel têkoşîn û bedelên giran niha ji bo me kurdan ev statuyek e. Ev me kurdan gelekî kêfxweş dike.

Li aliyê din hemû kurd, siyasetmedarên kurd, pêşengên kurdan hertim qala yekitiya neteweyî, Kurdistanek azad û serbixwe dikin. Di 25'ê îlona 2017'an de li başûrê Kurdistanê referanduma Kurdistaneke serbixwe pêk hat. Ji sedî 92,73 kurdên li başûr dijîn di vê referandûmê de gotin "Erê" yanî serxwebûn xwest. Bêguman mafê her gelî ye ku xwe bi xwe rê ve bibe û serbixwe bijî. Mafê me kurdan e jî.

Ez ê werim ser mijarê. Di 20'ê cotmehê de Parlementoya Katalonyayê Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê (Rojava) naskir. Ev ji bo me kurdan mijareke girîng e û li gel kêfxweşiyê kelecanekê jî dide avakirin. Lewra li cîhanê cara yekemîn e ku statuya Xweseriya Rojava ji aliyê parlementoyekê ve tê naskirin. Baş e, gelo çima hêj Rêveberiya Herêma Federal a Kurdistanê xweseriya Rojava nas nekiriye û çima nas nake? Gelo ew kesên daxwaza azadî û serxwebûna Kurdistanê dikin çiqas durust û samîmî ne? Ew kesên ku hêj hebûna parçeyekî din ê Kurdistanê nas nakin gelo bi çi nêtê (nîyet) qala serxwebûnekê dikin? Pêşiyên me dibêjin "Gîhayê hewşê tehl e" lê mirov ji gîha û nebatên li hewşa xwe hez dike, diparêz e û xwedî derdikeve. Bila şaş neyê fêhm kirin Rojava jî ne giyayê hewşa tu kesî ye. Gelo dibe ku mirov vê helwestê bi çavnebariyê ve girê bide. Bila kes li qusûrê nenêrin lê kes ji vê helwesta durû ya qirêj bawer nake. Bi hêsanî em dikarin vê jî bêjin, dewleta tirk, faris û ereb jî hebûna kurdên azad nas bikin dîsa jî kurdên kîndar, noker û xayîn nas nakin. Kî ji vê helwesta rêveberiya Başûr çi der dixin ez nizanim. Lê vekirî bêjim ev helwesteke ji dijminatiyê jî wêdetir giran û bi êş e. Heke aqilê mirov ji kîsê xelkê be, rêya rast li ber mirov nakeve.

# Bi gayê xelkê cot nayê kirin efendîno!

Aramê Elegezê

Civaka kurd di nav xwe de ji bo hinek karekteran rasterast pênase neke û neyne zimên, karekterên kesan bi navên rawir û ajalan pênase kiriye. Mînak; heke kesekî barên giran hilgirtibe jê re gotine 'wek hêstirekê ye'. Dîsa ji bo yê ku bi kesekî re li hev nekiriye, bêser û ber bi ser nas û nenasan de çûye, jê re gotine 'wekî kûçikekî har e'. Ji kesên li ser gotina xwe, sozên dane pêk anîne, li ber êrîş û tengasiyan serî netewandine re gotine 'wek şêrekî ye'. Her wiha ji yên ku soz dane lê ew soz bi cih neanîne re jî gotine 'wek kerê nêr e'. Ji yên netebitî, bêsebir vir de û wê de dibeze, di karê xwe de bêrêk û pêk e, gotine 'wek nêriyê kovî ye'. Ji bo kesên bêhiş, ramana wî stewr û bêvîn re gotine 'wek gayekî ye'. Her wiha gotineke pêşiyên kurdan jî wiha ye: 'Golikek rêxoyî navê garana gundekî diherîmîne'.

Bêguman pênaseyên civakê ezmûnên civakê yên rabirdûyê. Her gotinek wateya xwe ya taybet heye. Her gotinek bi xwe re giraniyekê tîne. Dilê hinek kesên konkirêt diêşîne. Janê dixe hiş û sewdaya wan. Gotinên baş ji çêkirinê re rê vedikin; ên bêwate avê şolî dikin. Civak jî li gorî helwestên baş an xerab an jî li gorî taybetmendiyên kesayetiyên konkirêt ji şîroveyên dûr û dirêj bêtir, bi pênasiyên şênber wan bi nav kirine.

Lê mijara me ya îro ne der barê hinek taybetiyên kesayetiyên di nava mirovan de, mijara me ya bi navê gê ye. Divê ga wek ajalekî kedîkirî, rol û erka wî di nava jiyana gundiyên berê de bê nasîn.

Weke ku tê zanîn, ga ji çêlekê wek ga nayê cîhanê, lê dema dibe sê salî tê xesandin. Ango zayenda wî ya xwezayî ya nêrîtiyê dikujin. Piştî xesandinê ga roj bi roj bihêz dibe. Di karên cotkariyê û bi erebeyên bar dibe hêza herî qayîm. Lê ji hêla din ve dibêjin qey ew tiral dibe, mîna ku nikaribe bi lez bibeze. Bi gayên din re û bi conegayên din re nakeve nava şer. Ji ber derê mala xwediyê xwe dûr nakeve. Di encamê de ew taybetmendiyên xwe yên sirûştî winda dike. Dibe wekî robotekî, xwediyê wî çawa dixweze wisa dike.


Xwediyê gê, di destpêkê de bi dengekî normal `hoo!`yî gê dikir û qamçiyên xwe li erdê dixist da ku ga bimeşe û bide lezê. Lê heke gê guh nedida xwediyê xwe û biçêriya, careke din dengê xwe bêtir bilind dikir û bi hêrs qamçî li erdê dixist. Dema qamçî li erdê diket dengê qirçîniyê zêde dibû. Gê bi vî awayî guh li helwesta xwediyê xwe bel dikir. Dema xwedî dest diavêt guhê wî heke bêyî dilê wî be jî diket rê û diçû. Stûyê xwe dida bin nîr. Ew bêdeng û bêbertek li benda xwediyê xwe dima. Heta ku xwedî nîr bida ser stûyê wî û rêyek nîşanî wî bidaya; hingê ew dê di wê rêyê de bimeşiyaya.

Demên berê, ji beriya ku traktor derkevin, bi giranî karên çandîniyê, rakirina (ajotina) erdê, hemû karên kotanê gê bi gê pêk dianîn. Her wiha erebeyên bi du yan jî çartekeran hebûn. Ga bi wan ve girêdidan û barên xwe ji cihekî vediguhestin cihekî dinê. Ji erebeyên çarteker re digotin firxun, ji yên duteker re jî digotin kaşke. Ji bilî vê karekî din jî ji bo gê hebû. Ew jî dema zeviyên genim an jî ceh dihatin dirûtin (dema nandirûnê), pûş li bênderê (ji xirmankutê) wek gêreke gilover radixistin. Piştre kam (xirman) li ser digerandin. Kam texteyekî darîn ê qalind e. Biqasî du metreyan dirêj û biqasî metire û nîvekê jî bi ber e. Serê wî yê pêşiyê ber bi jor ve tewiyayî ye. Ji binî ve kevir-heste, nalên ga ên kevin an jî parçeyên şûşeyên din bi rêzê bi binê wê kamê ve diniqandin. Ew li paş gê girêdidan. Mirovek li ser kamê disekinî. Carna zarokek jî bi wî re lê siwar dibû. Kam li ser pûş (sêp) digerandin. Heya ku ew sap baş hûr dibû, firîkên cê û gênim ji hev berdidan. Heya ew sap baş hûr bibûya, gê ew kam bênavber li ser sap digerand. Dema karê kamê diqediya, ka komî ser hev dikirin. Dikirin qûçekê (Kom/Lod). Du mirov li hember hev disekinîn, pişta xwe didan aliyê bê û bi şeneyan (melhêvan) ka li ba dixistin. Ka ji qûçê (komê) dûr dixistin, hebên ceh û genim diweriyan jêr û di cî de diman.

Mirovan ji bo karên xwe yên giran ga perwerde kiriye. Ji bo pêdiviyên xwe yên malbetî ga bikar aniye. Bi demê re ga ji pergala xwe ya xwezayî dûr ketye. Di nava karên mirovan de êdî wek mekanîzmeyeke bêhest û mejî hatiye bikaranîn.

Di encamê de ga bêmejî, bêhiş û bêbîr hiştine. Genim û cehê bi hêza wî çandin û gîhandine yên wî ne. Ew bêhêz e û nikare mafê xwe biparêze. Ji bo vê rewşa gê dîsa mirov gunehkar e û yên ga kirine wê rewşê mirov in. Li vir ev pirs tê hişê mirov, ga yan mirov? kîjan ji wan hêjayî dilovanî û nirxdayînê ye?

Her çiqas ga gayitiya xwe bike jî lê dîsa bi gayê xelkê cot nayê kirin. Gayê xwefiroş bêkêr e. Qet karek jê nayê. Xeta gayê pîr tu carê rast nabe. Ga bêzar û bêziman e. Gunehê wî çi dibe bila bibe, lê disa jî xiyanetê li mala xwe nake!





## Bajarê Çewlîgî ra zî Akşenere rê reaksîyon

Sereka Pêroyî ya Partîya ÎYÎ Meral Akşenere Sêrt de vejîyabî zîyaretê esnafan û ewja de esnaf Cemîl Taşkesen aye rê vat bî 'Tîya Kurdîstan o'. Vatiş ra dima Taşkesenî ame destbendkerdiş û badê îfadegirewtişî serbest ameybî veradayîş. Vera destbendkerdişê Taşkesenî de reaksîyonî virazîyayî û xeylê kesî vatî 'Tîya Kurdîstan o'. Akşenere Çewlîg de wexto ke otobus ra ameyene war zî hetê welatîyêk ra ameye şermizarkerdiş. Dîmenê ke ameyî parekerdiş de yeno eşnawitiş ke kesek qîreno vano 'Ti ameya Çewlîg rayan wazena'. Ame zanayene ke no kes ameyo destbendkerdiş. ***ÇEWLÎG***

## 4 aktîvîstê cinîyî ameyî kiştene

Afganîstano ke 15ê tebaxe de hetê talîbanî ra girîya binê kontrolî de 4 aktîvîstê cinî hawayêko kişte ameyî dîyayene. Cenazeya Forouzan Safî ke ame şinasnayene û 3 aktîvîstê bînî çalêk nizîyê bajarokê Khalid ibn al-Walidî yê bajarê Mezar-i Şerîfî de ameyî dîyayene. Ame vatene ke Forouzan Safî ya ke têkoşînê cinîyan de hawayêko aktîf ca girewtêne, ûnîversîteyêk taybet ya bajarê Mezar-i Şerîfî de ders dayêne. ***KABUL***

## HDP do verpawitişê xo bido mehkema

Komîsyonê Huqûq û Heqanê Merdiman yê Partîya Demokratîke ya Şaran (HDP) derheqê dewa qefilnayîşî de do verpawitişê xo bido Mehkemeya Qanûnê Bingeyî. Dîya zanayene ke roja îne saete 16.00 de verpawitiş ame dayene. Wina pawîyeno ke verpawitişî ra verî Merkezê Pêroyî yê HDPyî de çapemenîye rê eşkerayîyêka kilme do bêra dayene, derheqê verpawitişî de agahîyî do bêrê dayene. ***ANQARA***

## Krîzê qelbî ra dima îşkence

Tepiştyeyê bi nameyê Aldulcelîl Dagtekîn (35) Zîndanê Mêrdînî de 30ê teşrîna verêne de krîzê qelbî derbaz kerd û tetkîkan ra dima revîrê zîndanî ra erşawîya koxûşî. Dagtekîn 31ê teşrîna verêne de reyna bêhal bi, erşawîya koxûşî û dima reyna bêhal kewt. Bire dîyaye ke Dagtekîn sewqê Nêweşxaneyê Dewlete yê Mêrdînî bêro kerdene. Verî ke Dagtekîn cinişo ambulansî cebdirmeyan serê ci kontrol kerd û waşt biewnê zereyê fekê ci. Dagtekînî no qebul nêkerd coka sewqê nêweşxaneyî ame kerdene. Komîsyonê Heqanê Merdiman ê Baroyê Mêrdînî muracatê Serdozgerîya Komare kerd û gerreyê mesuldaran kerd. ***MÊRDÎN***

# Esnaf vano: Tîya Kurdistan o

| Merkezê Xeberan

Cemîl Taşkeseno ke Sêrt de esnafî keno, seba ke Akşenere rê vat 'Tîya Kurdîstan o' ameybî destbendkerdiş. Dima ra akademîsyen Hîfzullah Kutumî serê hesabê xo de parekerdişê 'Bicuyo Kurdîstan' pare kerd û gure yê xo ra ame girewtiş û desbendkerdiş

Cemîl Taşkeseno ke Sêrt de esnafî keno, seba ke zîyaretê esnafan yê Sereka Pêroyî ya Partîya ÎYÎ Meral Akşenere de aye rê vat 'Ziwanê ma yeno înkarkerdiş. Kamîya ma yeno înkarkerdiş. Kurdîstan yeno înkarkerdiş. Ma vera na rewşe de yî. Cayo ke şima nika tede yî Kurdîstan o, la çi heyfo ke Kurdîstan meclîs de yeno înkarkerdiş' 29ê Teşrîna Verêne de ame destbendkerdiş û bado ke îfadeyê ci ame girewtiş serbest ame veradayîş.

Dima ra Unîversîteya Firatî ya Xarpêtî de Beşa Malîye, Zanistê Îdarî û Îqtîsadî ra Akademîsyenê Cigêrayîşî Hîfzullah Kutumî serê hesabê xo yê medyaya dîjîtalî de parekerdişê 'Bicuyo Kurdîstan' pare kerd û dekanîya unîversîte derheqê Kutumî de tehqîqat da destpêkerdiş û dima ra gure ra ame girewtiş. Ame zanayîş ke badê parekerdişê Kutumî serê berê ci de beyraqa tirkî ame daliqnayîş û vatişê nîjadperestî û tehdîtkarî ameyî nuştiş. Verê berê Kutumî de çend nîjadperestî pê giştan îşaretê nîjadpersetî fotografan antî. Tewr peynî ame zanayîş ke Kutumî bi hawayêko hêrişkar ameyo destbendkerdiş.Wextê destbendkerdişê Kutumî de vera ci de hêrişî virazîyayî. Badê vatişê 'Tîya Kurdîstan o' ke Sêrt de zîyaretê esnafan yê Meral Akşenere de aye rê vatbî, bî na mijare kewt rojeva sîyasî û yê ke wina vatî zî sey esnaf Cemîlî ameyî hedefgirewtiş. Hêrişan ra dima şar de reaksîyonêk virazîya û wayîrvejîyayîşê Kurdîstanî zêdîyayî.




Rêxistina HDPyî ya Agirî û Wanî zî wexto ke seba 'Darbeya 4ê Teşrîna Peyêne' eşkerayî dayene polîsan hêrişê HDPyijan kerdbî û hemserekê HDPyî yê bajarî Semra Ozden û Erol Berke zî tede 6 kesan bi derbkerdiş destbend kerdî. Polîsan waşt çalaki asteng bikerî la xoverdayîşê welatîyan ra dima çalakîya roniştişî dest pêkerd. Dayika ke ame destbendkerdiş zî silogan eşt û vat 'Kurdî do şima rê sere nêtewinî'.

# Amed paytextê Kurdistanî yo

Cemîl Taşkeseno ke Sêrt de esnafî keno, seba ke Sereka Pêroyî ya Partîya ÎYÎ Meral Akşenere rê vat 'Tîya Kurdîstan o' ameybî destbendkerdene. Amedijî paştî dayî Taşkesenî û vatî 'Tîya Kurdîstan o, kesêk nêeşkeno înkar bikero'

Esnaf Cemîl Taşkeseno ke Sêrt de esnafî keno, seba ke zîyaretê esnafan yê Sereka Pêroyî ya Partîya ÎYÎ Meral Akşenere de vat 'Tîya Kurdîstan o' 29ê Teşrîna Verêne de ame destbendkerdiş û bado ke îfadeyê ci ame girewtiş serbest ame veradayîş. Rayaumûmîye de reaksîyonê vera destbendkerdişê Taşkesenî gird benî û amedijî zî vatî kesêk nêeşkeno raştîya Kurdîstanî înkar bikero.

Welatîyê ke qisey kerdî ra Erdal Guneşî vat ke ma Meral Akşenere serranê 90an ke aqubetê xeylê kesan hema zî nîno zanayîş ra şinasnenê û wina vat: "Ferqê Akşenere Erdogan û Bahçelî ra çinî yo. Weçînayîş nizdî beno û paştîya kurdan ra fikrê xo yê polîtîk nîşan danî. Vanê qey wina bikerî do weçînayîş de ser bikewî. Erdogan bi xo zî 20 serrî yo wina nêkeno? 80 serrî yo ke eynî polîtîkayî yenê rayraberdene. Derdê înan tena kurd o. No welat de vêşanî û betalî çinî yo? Biewnenê tarîxî, yê ke dima ra koçê tîya kerdî ê yî."

**Tîya de cîya Anqara de cîya**

Guneşî dewamê qiseykerdişê xo de bale ant zîyaretê esnafan ser o û va: "Sîyasetmedarî wexto ke yenê herême çîyêk vanî la wexto ke şonî sewbîna çîyêk qisey kenî. Mesut Yilmazî ra bigêrêne heta Erdoganî pêro wexto ke yenî tîya benê kurd. La wexto ke şonê Anqara rayna eynî polîtîkayan dewam kenê. Ma înan zaf baş şinasnenê. Ewro tabelayê kurdîyan anê war la yê ereban daliqnenê. Muameleye seke kurd dima ra ameyo tîya û ereb wayîrê tîya yî yeno kerdiş. Seba ke ma ra tersenê wina kenê. No ters besê înan o. Ganî kurdî xêza xo ra nêvejîyî. Heta nika senî xover dayo se ganî tîya ra pê zî wina xover bido. Ma besê yewbînan î."

**Dinya zana ke tîya Kurdîstan o**

Mehmet Demîrpolîtî zî vat ke qiseykerdişê Meral Akşenere ke meclîs de kerde şaş o û va: "Heqê Akşenere çina ke ma rê vaja terorîst. HDP meclîs de sîyaset keno, deste înan de çek çinî yo. Nêbeno ke kesêk seba vatişê Kurdîstanî sey terorîst bêro namekerdiş. Serekkomar Erdogan zî vat Kurdîstan û Yavuz Sultan Selîmî zî vat Kurdîstan. Bi hezaran kesî vanê Kurdîstan. Pêroyê dinya zana ke tîya Kurdîstan o. Akşenere sîyasetmedarêka kehen a. Ma tewrê qiseykerdişê o esnafî benê."

**Seba her vatişêk tepiştiş**

Mehmet Sadik Karacoşanî qiseykerdişê xo de da zanayene ke nameyê cayê herêma înan Kurdîstan o û kesêk nêeşkeno na raştî înkar bikero. Karacoşanî dîyar kerd ke yeno binpaykerdiş, hewl dîyeno ke kurd bigîrîyo binê kontrol û kurd seba her vatişêk yeno tepiştiş.

Mustafa Alanli wina vat: "Vatişê Kurdîstan azadîya firkî yo. Tîya Kurdîstan o, vatişê no zî suc nîyo. Sêrt, Amed, Şirnex û pêroyê rojhelatî Kurdîstan o. Na raştîyêk a. Pê teda û hêrîşan hewl danê ma çinî bikerî la ma do înan çinî bikerî."

Seyfettîn Ateşî bale ant etnîkanê cîya-cîyayan yê herême ser o û wina dest pêkerd: "Nîjadê cîya û kulturê cîya tîya de pîya cuyenî. Labelê nameyê tîya Kurdîstan o. Ganî seba vatişê Kurdîstanî merdim nêro tepiştiş. Kesê ke yenê tîya sere de vanê 'ê tîya Kurdîstan o' la wexto ke şonê teberê tîya vanê welatêk winasî çinî yo. Amed Kurdîstan o."

**Vatişê Kurdîstan suc nîyo**

Ferhat Gurelî îfade kerd ke azadîya fikrî çinî yeno hesibnayene û şenik daxî bibo kesêk wexto ke fikrê xo eşkera keno yeno destbendkerdene û va: "Merdimêko 96 serre daxî Erdoganî rê heqaret ra yeno tepiştene. Ê ke vanê Kurdîstan zî yenê tepiştene. Îqtîdar her çeku suc hesibneno. Vatişê Kurdîstan suc nîyo. Tîya Mezopotamya yo û Kurdîstan o. Ma xoserîya xo û ziwanê xo wazenê. Seba ke ma vanê Kurdîstan ma terorîst benê."

**Ma tîya nêdanî kesêk**

Amedijan ra tewr peynî Ozan Serhat Dogrucu qisey kerd û o zî nê çîyan ard ziwan ser: "Seba ke kurd ziwanê xo û kulturê xo nêcuyo, her tewir hêrîşan kenê. Ziwanê ma daxî ma rê ameyo qedexekerdiş. O esnaf seba cuyayîşê ziwanê xo raştîyan vat. La ê ne ziwanê ma û ne zî cuyayîşê ma nêwazenê. Destur nêdîyeno ke ma vajî 'tîya cayê kurdan o'. Vera nê kerdişan de reyna zî ma vanê tîya Amed o û paytextê Kurdîstanî yo. Ma tîya nêdanî kesêk. Wexto ke weçînayîş beno nizdî vanê 'êy tîya ê şima yo, şima heqlîyî' la badê weçînayîşî kam merdo, kam mendo xemê înan de nîyo. Ganî kurdî nêrî nê kayan û çimanê xo akerî. Wa nêrî kayê meqerne û komirî. Wa nêrî xapînayene. Ganî ma wayîrê ziwan, kamî û kulturê xo bivejîyî." ***AMED***



# Çortan, zêr û kêr

Riza Uyar

Du siwarê ku barê wan toraq û Çortan in ji hêla Mûşê tên diçin Pasûrê, lê li geliyê Mûşê şev bi ser wan de tê û rêya xwe wenda dikin. Heta demekê di cihê xwe de disekinin, paşê dengê kûçikan tê guhên wan û xwe li dengê kûçikan digirin û diçin li ber deriyekî disekinin. Bi dengê hespan re xwediyê malê derdikeve derve. Dinihêre va ye du siwar li ber derî ne. Xwediyê malê dibêje hûn kî ne û ji ku derê tên û hûnê bi ku de biçin?

Rêwî dibêjin welehî em ê biçûna Pasûrê lê şev bi ser me de hat û me xwe li we girt.

Xwediyê malê dibêje êêê de baş e, barê xwe deynin û hespên xwe bikişînin axurê û werin jor. Ên rêwî dibêjin barê me giranbuha ye, divê em wan li cihekî bi ewle deynin!

Xwediyê malê: çima barê we çi ye?

Rêwî: Ê hevalê min xencer û kêr in û yê min jî hemî zêr in.

Xwdiyê malê: Welahî ji cihê min ewletir tu cih tun ye, em ê barê we jî têxin axurê ji ber ku ji axura min çêtir tu cîh tun ye!

Rêwî hespên xwe dikişînin axurê û alavên xwe ji ser hespan datînin û diçin jor.

Xwediyê malê ji wan re nivînan radixe û dibêje şev baş û diçe; mêvan çav li derî û li benda şîvê ne lê tu şîv û mîv nayê. Heta derengiya şevê disekinin lê ne şîv tê û ne jî xew.


Ji wan yek dertê eywanê dinihêre ku dîzik li ser agir e û dikele, zilam derxûna li ser devê dîzikê hiltîne û dinihêre ku qazek xistine dîzikê û qaz pijiyaye û bûye wekî helîse. Zilam qazê ji dîzikê derdixe û coteke çarox dixe dîzikê, qazê dibe û diçe cem hevalê xwe.

Herdu mêvan goştê xwe dixun û radizên. Serê sibehê radibin ku xatir ji xwediyê malê bixwazin û biçin. Xwediyê malê tê gel wan, mêvan dibêjin heke tu destûra me bidî îca em ê biçin, mala te ava be ku te me hewandin. Xwediyê malê dibêje mêvan mêvanê xwedê ne, pêwist e ku mirov wan bihewîne, lê ne yên derewker! Pirsekê ji yekî wan dike û dibêje gelo tu çend salî yî?

Mêvan dibêje welahî ez nizanim ku ez çend salî me, lê sala ku çarox begê avêtibû ser dîz begê û qaz begê tê de dîl girtibû wê çaxê ez xort bûm! Îca mêvan ji xwediyê malê dipirse û dibêje pismam gelo tu çend salî yî? Pismam dibêje welehî ez baş pê nizanim, lê tişta ku ez pê zanim roja ku çortan bûbûn xencer û kêr û toraq jî bûbûn zêr, aha ez du roj beriya wê bûyerê ji bavê xwe cihê bûbûm!




# Tiştanok (mamik)



Me dîsa ji we re çend tiştanok ango mamikên xweş amade kirine. Her wiha em dixwazin hûn ji kerema xwe tiştên li ba xwe binivîsin û ji me re rêkin E-maila rojnameyê da ku em wan jî biweşînin.

**1-**Ez çûm aşekî, aş dêm e
Min got: Aşo tu çi aşî?
Got: Ez hesabdarê dinê me
Gelo ew çi ye?

**2-**Tiştek min heye
Mamê mino
Ez çûm gitê
Min anî stûna du gulte
Êxist nêvrana bavê te
Bû çirçira diya te
Kî dizane ew çi ye?

***Çavkanî: Mamikên Botanê***
***Berhevkar: Rênas Xendekî û Dildar Botî***

**Bersivên me ev in:**
**1-** saet, katjimêr **2-** Meqes

# Qeymeqam û xwediyê kerê

Rojekê qeymeqamek hê nû tayînî navçeya Kercewsê bûye. Ew û ajokarê xwe yê fermî dibêjin ka em li gundan bigerin, ka çi pirsgirêkên gundiyan hene da em zanibin .

Di rê de diçin leqayî zilamekî kal tên, dibînin ku kalemêr bi hefsarê kerê xwe girtiye û bi zorê li pey xwe dikişîne. Qeymeqam dibêje ajokarê xwe: Ez aciz im ka em hinekî tinaz û henekên xwe bi vî zilamî bikin da ku kêfa min were cih.

Ji ajokarê xwe re dibêje maşînê bisekinîne. Ajokar maşînê disekinîne û qeymeqam dibêje xwediyê kerê: Xalo xêr e tu vî zarokî bi ku ve dibî û qeymeqam bi gotina xwe re dike tîqe tîq û dikene.


Xwediyê kerê dibêje: Kurê min ez wî dibim dibistanê (mektebê).

Dîsa dibe hirehira kenê qeymeqam û dibêje :

Amca ji bo xwedê ma ker qet diçin dibistanê, tu çima wî dibî dibistanê? Xwediyê kerê ji xwe aciz bûye, kerê wî nameşe û li wan dinêre ku ew kenê xwe pê dikin, radibe wiha bersiva qeymeqam û ajokarê wî dide: wele ez ê herim wî tomar bikim heke xwend belkî bibe qeymeqam heke nexwend jî bila hema bibe ajokar.

***Amadekar: Nasir Aslan***

# XAÇEPIRS




**JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ**

1. Reş, esmer 3. Zeviya ne bejî 5. Firoşkarên berê li gundan digeriyan
6. Paytexta Îtalyayê 7. Alaveke şer a kevin 9. Enirî, xeyidî
12. Koma giyayê ji bo xwrina sewalan dihate hûnan û hilanîn
14. Ji bo 15. Navmalî, xebatkarê otêlê yê berpirsê jûreyan
17. Wecih 18. Bersiva neyênî 22. Porê pêşenîkê

**JI JOR BER BI JÊR**

1. Tunekirin, qelandin
2. Celebeke wêjeyî ku ji çîrokan dirêjtir e
3. Agir 4. Rojeke hefteyê
5. Banga mele ya ji bo nimêjê
7. Çekdar, têkoşer
8. Xelkê Rûsyayê
10. Navê parêzerê N. Mandela... paşnavê wî Mûsa bû
11. Bajarekî dîrokî yê bakurê Kurdistanê
13. Dengî, daxuyanî
14. Evîndarê Adûlê, ...Evdî
16. Kesên ne zewicî
19. Arvan
20. Amûreke muzîkê
21. Sewaleke ku ji bo hirî û goşt tê xwedîkirin
23. Cînavkeke tekakesî

## Bersiva hefteya borî



# Ev dêr şahida hevgirtina gelan e

Dêra Mar Circis a li gundê Derîcîlk bûye şahida hevgirtina suryan, misilman û êzidiyan. Piştî ku dêr bi beşdariya hemû pêkhateyên gund hat avakirin, bûye nîşaneya jiyana hevbeş





Li gundê Derîcîlk ku bi 2 kîlometreyan li bakurê navçeya Tirbespiyê ya kantona Qamişloyê ye, Suryan, misilman û êzidî ji demeke dirêj ve bi hev re dijîn. Lê mixabin piştre gelek suryan û êzidî jê koçber bûn.

Li bakurê gund, xaça li ser dêreke biçûk a li qada gund hatiye avakirin balê dikişîne. Dêra ku ji dêreke suryanan veguheriye meqsada hemû pêkhateyan ji aliyê şêniyên gund ve tê parastin û malbateke suryan pê re mijûl dibe.

**Çîroka avakirina dêrê**

Gundê Derîcîlk di serdama borî de rêya sereke bû ku navçeya Tirbespiyê bi gundên herêma Cerah û Aliyan ên gundewarên bakurê wê ve girê dida û tê de Eşû Marûkî El-Suryanî dima. Ji ber şert û mercên dijwar ên piştî qanûna guhertina çandiniyê di dema Cemal Ebdulnasir de (1958-1961), gelek malbatên li herêma Cizîrê diman, xizan bûn û zeviyên xwe ji dest dan. Di encamê de gelek ji wan neçar man ku ber bi bajarên Sûriyê yên din ve koçber bibin û hinek jî çûn derveyî welêt.

Welatiyê suryan Eşû Marûkî ji kesên ku koçber bûne û ji bo kar û peydakirina debara malbatê çûye Libnanê. Lê piştî çend salan vedigere gund û ji xelkê gund re dibêje ku vegeriyaye da ku dêrê ava bike.

Muaz Ezîz ku ji misilmanên gund e, got: "Eşû ji gundiyan re gotiye ku ew li Libnanê her tim di xewna xwe de Mar Circis dîtiye ku jê dixwaze vegere gund û dêrekê li şûna mala xwe ya li aliyê bakurê rojhilatê gund ava bike."

**Her kes tev li avakirinê bû**

Şêniyên gund ên ji pêkhateyên cuda ji Eşû re dibin alîkar da ku dêrê ava bike ji ber ku derfetên wî yên madî têrê nakin. Êzidiyên gund jî dema di avakirina dêrê de kar dikirin, digotin "dêr e û xêr e". Heta niha ev gotin li gund tê gotin.

Muaz wiha domand: "Li ser bingeha baweriya me bi jiyana hevbeş, sala 1971`ê Kurdên misilman, êzidî û xiristiyanên gund, bi derfetên xwe bi hev re dêr ava kiribûn."

Muaz diyar kir ku li gorî mezinên gund, dema esasên dêrê tên kolandin, xaçeke kevin tê dîtin. Ev îsbat dike ku di bin mala Eşû de dêreke kevin a asûriyan hebûye.

**Êzidî û misilman jî diçin wê dêrê**

Di salên 1990`î de pêleke koçberiyê ya mezin ber bi Ewropayê ve çêbû. Hejmareke pir hindik a malbatan ma. Lê ruxmî wê jî dema ku welatî serdana gund dikin, destpêkê diçin dêrê û alîkariyê didinê.

Corc Marûkî neviyê Eşû ku berpirsê dêrê ye, bi bîr xist ku ciwanên êzidî yên li gund mane, dêrê diparêzin.

Ciwanên êzidî û yên misilman ên navçeya Tirbespiyê dibêjin ku dema biçûk bûn tevî malbatên xwe serdana dêra Mar Circis kirine û mûm pê xistine.

Stûnên dêra Mar Circis a li gundê Derîcîlk bûne mînaka jiyana hevbeş a di navbera pêkhateyan de. Bi saya avakarê dêrê Eşû Marûkî dêr heta îro saxlem maye. Kurê wî Yaqûb heta çû ser dilovaniya xwe, xizmeta dêrê kir û li qada dêrê li rex bavê xwe hat veşartin. Îro jî neviyê Eşû Corc karê kal û bavê xwe didomîne. ***TIRBESPIYÊ***





# Ji bo temaşekirina vê TV'yê 7 sal ceza heye

Li Belarusê kanaleke bi navê "Belsat" heye ku kanala muxalefetê ye. Navenda kanalê li Varşovaya Polonyayê ye û li ser peykê re li wir weşanê dike. Rêveberiya Belarusê ev kanal wekî "Rêxistina radîkal" bi nav kir û li gor zagonên welat "yên ku li vê kanalê bixebitin û yên ku vê kanalê temaşe bikin dê bi 7 sal cezayê hepsê bêne cezakirin".

Belsat cih dide agahiyên muxalefetê lê dewlet li dijî vê yekê ye. Îsal di meha reşemiyê de du rojnamegerên çalakî dikişandin hatin tewqîfkirin.

Piştî dewletê ev biryara qedexeyê girt, hat gotin ku Wezareta Karên Hundir bi ser peykê yan jî bi ser înternetê re temaşekirina vê kanalê qedexe kiriye.

Li aliyê din rêveberiya Belsatê li hemberî vê yekê got ku ev biryar biryareke beredayî û vala ye. Franak Viacorka ku şêwirmendê muxalefetê Sviatlana Tsikhanouskaya ye bi ser twittirê re wisa nivîsî: "Li dinyayê yekemîn car rejimek temamê kanalê qedexe dike. Ev yek bandorê li 940 hezar kesan dike. Li aliyekî tehdîd dikin, li aliyê din jî ev biryar serketina kanalê nîşan dide."

Wekî tê zanîn Belarus welatekî Ewropayê ye. Polonya, Ukrayna, Lîtvanya û Rusya cîranên wê ne. Bajarê wê yê mezin Minsk e. Zimanê fermî belarûsî û rusî ye. Sedî 81 belarusî, sedî 11,4 rusî, sedî 2,4 ûkraynayî li wir dijîn û ligel wan hin kêmareyên din jî.

Berasul di sala 1990'î de ji Yekîtiya Sovyeta Berê veqetiya û bû serbixwe. Serokdewletê Aleksandr Lukaşenko di sala 1994'an de hat ser kar û hê jî li ser kar e. Di sala 2006'an de Yekîtiya Ewropayê ew jî di nav de çûyîna 31 rêveberên wî ji bo Yekîtiya Ewropayê qedexe kir. Li Belarusê anket, dîtin û axaftinên alîgirên muxalefetê qedexe ne. ***MINSK***

# Sezona şanoyê bi Mem û Zînê dest pê kir

Şermola Performans nêzîkî salekê ye xebatên online çê dike û li ser dîroka şanoyê, nivîsîna dramatîk û li ser teoriyên lîstikvaniyê dersan dide. Her wiha di vê serdemê de bi lîstikvanên ku li bajarên cuda dijîn re jî xebatên xwendinê û ceribandinên lîstikên onlîne pêk anî.

Bi saya van xebatan nivîskar û derhênerê Şermola Performansê Mîrza Metîn lîstikvanên wek Pelda Bal, Kenan Demîr, Ronî Dildar û dramatur Zelal Angay nas kir û biryar da ku li Batmanê bi wan re li ser lîstikekê bixebite.

Xebatên lîstikê berî deh mehan li ser bernameya Zoomê dest pê kir û Mîrza Metîn ji bo ku di hişê lîstikvanan de bingehekê ava bike bi wan re li ser têgihên wek mîtolojî, rîtuel, lîstik, performans, mêtingerî, çanda gelêrî, vebêjî û hunera hemdem xebitî û li ser van hêmanan xwendinên dirêj pêk anî. Metîn piştî van xebatên teorîk ji Almanyayê hat Batmanê û tevî lîstikvanan dest bi xebata piratîkî kir. Dramatur û alîkara derhêner Zelal Angay ji bo vê xebatê ji Enqerê, dansvan û koreograf Arjen Brûsk jî ji Stembolê hat Batmanê.

Bi sedan dengbêj û çîrokbêj hene ku îro jî destanên kurdan bi awayekî kilamkî û vebêjkî îcra dikin. Mem û Zîn jî yek ji wan destanan e ku bingeha xwe ji destana Memê Alan girtiye. Her wiha Dengbêj Reso jî yek girîngtirîn ji dengbêjan e ku destana Mem û Zînê bi kilamkî û vebêjkî îcra kiriye. Mem û Zîn ku bi derhêneriya Mîrza Metîn ve dertê ser dikê xwe dispêre vê pirsê: "Kilamek, stranek, çîrokek ango destaneke gelêrî, bêyî ku weke teksteka şanoyê ji nû ve bê nivîsandin, çawa dikare bi rengekî nûjen bê sehnekirin?" Her wiha Mîrza Metîn bi salan e bi navê "Dîwan"ê ango "Dîwana Lîstikvaniyê" kargehan çê dike û bi lîstikvanan re li ser hereket, deng, nefes û vebêjiyê dixebite û hemû xebatên xwe dispêrîne dengbêj, çîrokbêj, govendger û şivanan; û van hêmanan bi rengekî nûjen di xebatên xwe de bi kar tîne û hewl dide ku şêwazeke xwemalî ya xebata şanoyê biafirîne. Lewra şanoya Mem û Zîn yekem berhema şêwaza "Dîwan"ê ya ku dê di 3'yê Mijdarê de li Batmanê li Yenîsahneyê yekem car derket pêşberî temaşevanan.

Bi vê berhemê re Şermola Performans dê êdî li Batmanê jî bi berdewamî perdê vebike û projeyên nû biafirîne. Şermola Performans her wiha xebatên xwe li Stembol û Almanyayê jî didomîne.

Ji bo agahiyên berfirehtir hûn dikarin li malpera www.sermola.com binêrin.

***Dîrokên din ên performansa Mem û Zîn ev in:***

***16, 30'ê Mijdarê, saet 19:30.***

***Cih: Batman Yenîsahne***

***Çavkanî: Dengbêj Reso***

***Konsept/Derhêner: Mîrza Metîn***

***Lîstikvan: Pelda Bal, Kenan Demîr, Ronî Dildar***

***Dramaturg/Alîkara Derhêner: Zelal Angay***

***Koreograf/Rahêner: Arjen Brûsk***

***Sêwirînerê Ronahiyê: Mîrza Metîn***

***Fotograf: Bariş Evîz***

***ÊLIH***

# Li Hamburgê 4 filman xelat girt





Festîvala Filmên Kurdî ya Hamburgê ya 12'an bi nîşandana filma 'Tiraşa dibistanê' bi dawî bû. Film li ser navendên asîmîlekirina zarokên Kurdan û dibistanên leylî yên dewleta tirk e.

Festîvalê weke mijara îsal 'Li 4 parçeyên Kurdistanê yek sînema' diyar kiribû. Ji Bakur, Başur, Rojava û Rojhilatê Kurdistanê bêtirî 40 filman ji 28'ê cotmehê heta 3'yê Mijdarê nîşan dan.

Komîteya festîvalê îsal cara pêşî xelatên jurî û xaletên taybet ên juriyê di beşa kurtefilman de jî dan.

Di festîvalê de 5 rojan li Zeise Kino, Kino 3001 û Mut! Theaterê bêtirî 40 filman hatin nîşandan.

Filma Pele ya derhêner Shoresh Vakilî hêjayî xelata filma herî baş hat dîtin. Film behsa xizmetkarekî paqijiyê li holeke sînemayê dike ku berê leşker bû.

Filma Quarantine yê derhêner Mohammed Reza Ardalan hêjayî filma herî serketî ya duyem hat dîtin.

Filma anîmasyon Cûdiyê Miradan a derhêner Semiha Yildiz jî bû sêyemîn a festîvalê.

Weke derhênereke siberojê wê serketî be, Evîn Berazî ji bo kurtefilma xwe Starting Over xelata taybet a juriyê wergirt. ***HAMBURG***

# Li Kurdistanê yekemîn festîvala pandomîmê



Dê li bajarê Silêmanî yê başûrê Kurdistanê cara yekemîn festîvala şanoya pandomîmê were lidarxistin. Festîvala ku di 7'ê mijdarê de dest pê kir ji aliyê Malbenda Giştî ya Silêmaniyê Komeleya Hunerên Ciwan ve hat lidarxistin.

Li gorî agahiyên Rojnewsê endamê komîteya damezrandina Festîvalê Xefur Ebdullah agahî der barê festîvalê de dan û wiha got: Ev festîval li Kurdistanê bû festîvala yekemîn ya şanoya pandomîmê. Armanca me ji vê festîvalê ew bû ku em vê şanoyê bi rêya leystikvanên şanoyê bi gel bidin danasîn.

Her wiha derhênerê şanoya koma Herayê Goran Sergeluwî jî da xuyakirin ku koma wan ya destpêkê ku tevli vê festîvalê bû, di leystika wan a şanoyê de 5 leystikvan hene û 3'ê ji wan jin in.

Goran, da xuyakirin ku arêmanca wan ew bû ku şanogerên herêmî û yên biyanî bi hev bidin nasîn. ***SILÊMANÎ***

xwebûn
8-14 Mijdar 2021 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 5 TL Hejmar: 99

İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi: Kadri Esen
Sorumlu Yazıişleri Müdürü: Elif Can Alkan
Yayın Danışma Kurulu: Abdulla Peşêw, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco
Yayın Türü: Haftalık Yaygın Süreli
Yönetim Yeri: Kooperatifler Mahallesi Cahit Sıtkı Tarancı Sokak İstanbul Apartmanı No: 18/6 Yenişehir / Diyarbakır
Baskı: Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı Bağlar / Diyarbakır
Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.

Ji bo abonetiyê
Tel:0 (541) 806 84 85

# Kurdên cîhana dêrîn; Hattî-Hîtîtî 9



Keştiya Alalû
Agît Yazar

Keya Murşîlî li gel artêşa xwe, meşa xwe ya ber bi paytexta Arzewa Efesê didomîne. Çemê Şehriya derbas dikin, xwe digihînin qontarê çiyayê Lewaşayê (eletexmîn, ev dever li derdora bajarê Efyonê ye) di wê heynê de tiştekî sosret diqewime. Pispor dibêjin dibe ev tişta diqewime ya bi heybet an bûyereke xwezayê ye yan jî qewimîneke ezmanî ye. An çiyayekî wolqanê diteqe yan jî meteorek ji ezmanan tê li rûkala erdê dikeve. Ev bûyer, her çi dibe bila bibe, ev tiştekî pir qutifîner e. Jixwe Keya Murşîlî jî diqutife. Me li jor jî got: “Devê wî dikeve tev û zimanê wî giran dibe.”

Ev zir-bûyer her çi dibe bila bibe; çi teqandina wolqanê, çi jî ketina meteoreke ji ezmanan. Eyan e ku ji herêmeke gelekî fireh û ew çend ji dûr ve hatiye raçavandin. Lewra di navbera bajarê Efyon û Efesa îro de nêzî 400 km mesafe heye û ji van herdu xalan ve ev zirbûyer hatiye dîtin. Li gor lêkolîner dibêjin, çar hezar sal berê, girekî wolqanê li derdora bajarê Ûşaxê çalak bûye. Ev çiyayê mijara gotinê, tam di navbera van herdu xalan de ye. Piştrastkirina vê yekê ew e ku Keya Murşîlî li derdora Efyon, Keya Ûhhazît jî li Efesê ji tirsa vê zir-bûyerê dikevin tev duqutifin.

Dema katibên Hîtîtê, vê bûyera derasayî neqlî ser kevalên dîrokê dikin, wiha pê pênase dikin: “GIŠkalmîš(a)na" ango 'Gişkalmîşana. Ev peyv tê wateya 'qamê birûskê' Di nava vê peyvê de, kîteya 'kalmîş' tê dîtin. Kalmîş ango qamîş, xwe digihîne reha peyva 'kel' a kurdî. Ji vê peyva 'kel' peyvên wekî qelem, kelem, kalan, qama, qamîş û hwd. lê zêde bûye.

Gava Keya Murşîlî qala vê zir-bûyerê dike, dibêje: "Dîtina min dît, gurmînî bi Xwedayê Firtoneyê yê Ezmanan ket. Gotinên nîvçe ji nava lêvên min pekiyan. Paşê jî devê min bi tûmerî terka min kir."

Tevî vê bûyera kesnedîtî jî Keya Murşîlî ji şer venagere. Dîsa jî dajo ser keyayê Arzewayê Keya Ûhhazîtî. Lê Keya Ûhhazîtî yê bizdiyayî, dernakeve qada şer. Kurê xwe mîrze Piyama-Kûrûnta dişîne şer.

Ev mîrzeyê xeşîm, li hember Keya Murşîlî li berxwe nade û têk diçe. Keya Murşîlî, piştî vê serkeftinê vêca berê xwe dide Welatê Çemê Seha yê. Ev welatê hanê jî di nava yekitiya federesyona Arzewayê de bû û di vê heynê de li hemberî Hîtîtê, siyaseteke durû dabû meşandin. Revokeyên ango mahkûmên Hîtîtê hebandibû. Digel soz dabû Hîtîtê ku ew ê ew revoke radestî Hîtîtî bikira lê di guherînên mercên demajoyê de, dev diguherîne û li sozên dayî nabin xwedî.

Lewma jî Keya Murşîlî, berî êrîşî vê mîregiyê bike, nameyekê ji Mîrê wê re dişîne û wiha dibêje: "Min revokeyên Hîtîtî yên xwe avêtibûn nava refên we, ji te xwestibû. Te ew radestî min nekir. Te muameleya tifalekî bi min re kir, di ser de jî te tinazê xwe bi min kir. De were, niha jî em deqê xwe li hev bixin û bi hev re şer bikin. Bila efendiyê min Yezdanên Ezmanan, heqşahidê me be."

Keya Murşîlî, hezar salî berî Îskenderê Makedonî, gava van serkeftinên mezin bi dest dixîne, bi temenê xwe ji Îskender jî piçûktir bûye. Divê neyê ji bîrkirin ku serfermandarên nola Nuwanza yê mêrxas jî di bereyên şer ên dîtir de, serkeftinên mezin bi dest xistibû.



Keya Murşîlî, digel ew çend dijwariyên jiyanê, li hemberî tu zehmetiyan çîz nekirîye; ji ber tu kesî danexwariye; çeka xwe ji ti kesî re serberjêr nekiriye. Heta gava li ber xwedayan jî geriya ye, di nava lavayên xwe de, bi wan re jî hinekî hêrs bûye û meriv dikare bibêje hinekî mineta wan jî h'êç kiriye. Birayê wî bi bêbextî tê kuştun, nexweşiya Webayê nola gundor di ser wan re gêr dibe û miletê wî mehû dike, bavê wî bi vê nexweşîya Webayê dimre, paşê birayên wî û herî dawî evîna wî Gaşşûlaviya hevjîna wî jî bi heman nexweşiya kujende ya Webayê dimre, dêmariya wî Tawananna ya Babîlî ti reng û rîpên nemayî namîne nayne serê wî, hemû mîregiyên di bin sîwana welatê wî de serî li ber wî radikin û kêfê lê diqewitîne, gava dajo li ser dijminê xwe di rêde li zir-bûyereke seyr rast tê û diqutufe lê dîsa jî vîna Keya Murşîlî ya polayî lawaz nabe, ji ti dijwariyan re çîz nake û ji ber wan danaxwe.

Lewma jî gava meriv ji serpêhatiya jiyana Murşîlî re serwext dibe, meriv ji vî cengawerî, ji vî merdemêrî re rêz digre û wekî kesekî ji kulfetê mala xwe dibîne. Lewra, em benîademî tev wanî xwedî heman xislet in; li hember êş û azarên jiyanê liberxwe didin, distewin û dikemilin.

Ev mirovê êşê giran, bi teperep, bi ketin û rabûn, bi xweşî nexweşî, li hember hemû xedariyan li berxwe dide. Encax piştî bîst salên qut û gilover, xeza nexweşiya Webayê ji pêxîla wî û xelkê wî vedibe. Di vê heynê de dijminên korfersend jî têkdişkên.

Keya Murşîlî, bi sedan duqûmentên hêja ji mirovahiyê re mîras dihêle û navê xwe bi tîpên zêrîn di rûpelê dîrokê de dinivîsîne. Her wiha welatekî bi ewle ji dûhatiyên xwe re dihêle. Gava roja wî tê, ew jî wekî her fanî, ji vê dinyayê bar dike û diçe. Nola dibêjin; dinyaya gewrik ji kesekî re namîne.

**Lehengê cenga giran: Muwatallî**

Keya Mûwatallî yê 2'em (B.Z. 1315 – 1282) derdikeve li ser textê Hîtîta bi hişmet. Mûwatallî, keyayek ji wan keyayê Împeretoriya Hîtîtê yê herî serkeftî ye. Mûwatallî, kurê keya Murşîlî ye û bavê wî welatekî di bin ewlehiyê de ji wî re mîras hiştibû.

Mûwatallî çawa derdikeve ser text, birayê xwe yê azwer û ew çend jî jêhatî, Hattûşîlî yê leheng dike serfermandarê yekîneyên ewlehîya qesrê.

Çend salên pêşî ji bilî Kaşgayiyan nenahs, hema hema ti kesî curet nekiriye li hember Hîtîtê rabe. Keya Mûwatallî, birayê xwe yê ji xwe biçûktir, Hattûşîlî yê mêrxas li hemberî Kaşgayiyên muzur erkdar dike û wê sergêjiya biçûk wanî bi tûmerî hil dike. Piştî birayê wî Hattûşîlî wanî di demeke kurt de Kaşgayiyan mutuh dike û hefsarên wan dixîne destê xwe, Keya Mûwatallî şerefyar dike û wî dike mîrê bakûrê welêt, ew herêma kaşgayî lê dijîn.

Piştî van pêngavên serkeftî û çend salên jiyîna di nava xweşguzariyê de derbasbûyî, êdî pirîskên arê xezebê ji başûrê welêt bilind dibe. Kesekî bi navê Ramses derketiye li ser textê Firewnê Misira sawdar. Tiştê tên gotin, eynî çîkên ar ji ber limgê wî dipengize; siya vî Firewnê gewî jî newêre bi wî re bimeşe û ji xwe re li hinceta digere.

Mîregiyeke bi navê Amûrrû tam di navbera Împeretoriya Hîtîtê û Misirê de ye. Ev mîregîya hanê timî nola darikê pelûlê her bûye sedema tevliheviyên di navbera herdu zir-dewletên gewre. Kîjan dewlet xwurt bûya, xwe davêt li pişta wê dewletê. Di vê heyna dawî de jî dîsa ev mîregîya hanê, dibe mîna fiçiya barûdê; tenê li bende pirîskekê bû. jixwe agirê ku Ramses xistibû dawa xwe, têr û sertêra fiçiya barûda Mîregîya Amûrrû yê dikir.



Keya Mûwatallî, sîxwurên xwe ji mêj ve erkdar kiribûn û salixdaniya vê tevlihevîyê hilanî bû. Lewma jî Mûwatallî ji geşedanan re baş serwext bû. Tavilê kirr û birra xwe dike û sê pêngavên gewre davêje:

**1-**Paytextê ji Hattûşayê koç dike tîne Dattaşşa ya li derdora bajarê Edene ya niha. Mebesta wî ew e ku gava bi Misiriyan re şer bike, Kaşgayiyên êrişkar neyê peykerên yezdanan yên li Hattûşayê talan nekin. Her wiha armanca Keya Mûwatallî ya duyem ew e ku xwe pirtir nêzî navenda Mîregiyên bi Cimeta Pankûyê ve girêdayî bike. Lewra Împeretoriya Hîtîtê, xwedî pergaleke federetîf bû û ji bîst û yek Mîregiyan pêkdihat.

**2-**Li hêla din welatê Hakpîşşaş û Îştaharaş dixîne bin fermanrewayiya birayê xwe Hattûşîlî. Bi vî awayî birayê xwe dike hevparê fermanrewaya Hîtîtê. Dibe ku ji birayê xwe bi fikar jî bûye û nexwestiye di rewşeke ew çend aloz de, lawaziyek pêk were.

**3-**Keya Mûwatallî, paytexta Hattûşayê jî teslîmî şêwirmend û katibê qesrê, Mîtannamûwa dike. (Mîtannamûwa ji navê xwe diyar e ku ev mirovê zana û bîrbir, bi eslê xwe Mîtannî ye. Ev jî bi me dide selimandin ku Hattî, Hîtîtî, Hûrrî, Mîtannî yek miletbûye û yekûna wan pêşiyên Kurdan bûne. Di xeleka li pêş, ez ê hinekî li ser vî ciwanmêrî tîr bibim)

Ramses ê 2'em, mîna Sfenkê Gîzeyê bi heybet û mîna marê teyar di çelpîna şer de bû.

Keya Mûwatallî jî xwedî ezmûna siyaseta Cimeta Pankûyê ya kone bû. Her wiha serfermandar Hattûşîlî yê mêrxas ku mîna xezeba bayê Yezdanê Bahozê, yezdan Teşûp û gurzê birûskê yê di destê wî de şewitîner, li pişta birayê xwe Mûwatallî bû.

**Şerê Qadeşê**

Qadeş, bajarekî li Geliyê Bekaayê ye û deriyê têketina kevana Zêrîn e.

Firewnê Misrê, Ramses ê 2'em, di sala xwe ya 5'emîn a desthilatdariyê de, bi çar gurdanan/tabûran ên ji bîst hezar leşker pêkdihat, ji welatê Nîlê derdikeve û berê xwe dide welatê jor, hêla welatê Hîtîta bi hişmet. Ev her çar gurdan ev in: Amon, Ra, Ptah û Set. Ev her çar gurdan ango tabûr, li gorî rêza navê xwe didin li pey hev û dimeşin. Ramses ê 2'em jî bi yekîneyên ewlehîyê yên taybet, ligel gurdana Amonê dimeşe.

Berî gurdana Amon xwe li çemê Orotesê (asî) bixîne, li derdora Rîbaha yê du heb revokeyên Hîtîtî yên di kirasê koçeran de tên, tev li yekîneyên Misrê dibin. Ev her du kes, casûsên Hîtîtan yên profesyonel in û agahiyên şaş didin Ramses ê 2'em. Dibêjin, artêşa Hîtîtan gelekî dûre, li derdora Halapayê/Helebê ye. Di vê navberê de gurdana Ra jî di tertîbatê meşê de ye. Ramses ê 2'em, ligel yekîneyên xwe yên taybet tê li bakûrrojavayê Qadeşê datînin û konên xwe vedigrin. Di vê heynê de, yekîneyên Ramses ê 2'em, du heb sîxwirên din ên Hîtîtî zeft dikin. Li wan îşkencê dikin da ku li xwe mukur werin ka artêşa Keya Mûwatallî li kuye û niha di çi tertîbatê de ye.

Xwînerên ezîz, werin em Ramses ê 2'em û artêşa wî li vê derê bihêlin û em herin li ba Keya Mûwatallî, ka bê ew çi dike...

***(Em ê beşên din ên rêzenivîsê li ser malperê biweşînin)***